




Siyasetmedar û rewşenbîrên Brîtanî:

Gelê kurd serokatiya xwe diyar kiriye

■ Dewleta di qada navneteweyî de navê terorîstiyê bi dû tevgera kurd xist û li ser vê esasê jî gelek komployên mezin li dijî gelê kurd pêk anîn. Lê ev tişt jî nikarin li ber navneteweyîbûna kêşeya kurd bibin asteng. Lewra Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan jî hêla parlamentoyên çend welatan ve hate vexwendin. Her wiha rewşenbîr û siyasetmedarên Brîtanî nameyek jî wî re şand û di nameyê de tê gotin ku hewlên Öcalan yên bû çareseriyê şayanî pesnê ne. (R. 3)



Parlamentera PDS'ê ya Eyaleta Bakur Felek Uca:
'Min divê dengê doza kurdan berztir bikim'



Şehîd-Bîranîn: Servet Denli

Wêje: Nameyek vekirî ji Leyla Zana re

Perwerdehî: Perwerdehî û hîndekarî-2

Nûçe: YÖK destikê MGK'ê ye

- Rûpel 6

- Rûpel 10

- Rûpel 4

- Rûpel 16

Mahmut Kılınç: Pêxwasiya li dijî kurdan


r.5

Serkan Brûsk: Du gotin

r.7

Osman Özçelik: Hilbijartin

r.13

Azadiya **WELAT**

SAMİ TAN

Gelek kesan li pişt generalan di merasîmekê de ref girtiye. Ev merasîm ne ji xêrê re ye. Divê ev merasîm nebe merasîma hêvî û daxwaza gelan a bo aşî û azadiyê.

Ev merasîm bo kê ye?

Mirov hin caran di fêmkirina nê û armanca dewleta tirk de dikeve tengasiyê. Rayedarên dewletê dixwazin çi bikin? Mebesta wan çi ye? Bi kîjan amûran dixwazin bigihêjin vê armançê. Niha bi girtina Alaatin Çakıcı armanca dewleta tirk çi bû? Serokwezîr û wezîr çiqas xwedî raye bûn di vî karî de? Gelo wan nizanibû ku dê têkilîyên wan bi wî kesî re eşkere bibin. Heke ne bi îradeya wan be, girtina Çakıcı çima bo xwe wekî serkeftinekê nîşan didin?

Em bibêjin ev tişt bi îradeya general pêk tî, heke wisa be general bi vê yekê dixwazin çi bi dest bixin? Gelo ew nizanin ku şerê qirê û civaka paqij digel hev nabin. Her kes dizane ku şerê qirê bi pereyên tilyaqê tê fînansekirin, heke ew çete bêne girtin, dê şer çawa fînanse bikin. Bi vê kampanyaya komarê dixwazin gel ji bikin şirikê komarê? Heke daxwaz ev be, bi vê yekê dê çi bi dest bixin? Dibe ku li aliyekî xwedêgiravî endam û berpîrsên çeteyan digirin, li aliyê din ji bo ku dengê gel bibirin çi ji destê wan tê dikin. Bo komarê meş û

çalakiyên girseyî li dar dixin, lê nahêlin ku deh kes li cihêkî bicivin û daxuyaniyeke çapemeniyê bixwînin. Berpîrsên partî û rêxistinên demokratîk tî girtin, çapemeniya dijber dibe hedefa êrîşên hêzên dewletê. Heta ji destê wan tê lê dixebitin ku saziyên demokratîk terorîze bikin, wan mecbûrî çalakiyên derzagonî bikin, da ku karibin wan ji holê rakin. Rê li ber çalakiyên demokratîk ên karker, karmend û xwendekaran digirin. Ji civakeke pir-deng û pir-reng dixwazin civakeke tek-tîp biafirînin. Slogana faşîstan a bi rengê "Ya sev ya terk et (ya hez bike, yan biterikîne) tê pêkanîn. Bi vê yekê dixwazin çi bi dest bixin? Gelo wan dil heye ku civakeke artêşî derxin holê? Heke wisa be, dê civakeke wisa li cihanê çawa li ser piyan bimîne?

Nakokî gelek in. Li gorî Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, wî agirbest li ser daxwaza hinek kesên di nava dewletê de îlan kiriye. Paşê derket holê ku wan kesan bi armanca lidarxistina komployê ev daxwaz gihandine PKK'ê. Aya ew kes

bi rastî bawer dikin ku dê karibin bi vî awayî kêşeya kurd çareser bikin? Tê nagihêjin ku komployeke bi vî rengî dê arîşeyên mezin bi xwe re bîne?

Serokê Giştî yê PKK'ê Öcalan got: "Werin em vî komarê hinek timar bikin û di nava aşî û biratiyê de bi hev re 75 saliya wê pîroz bikin." Çima dewleta tirk li şûna riya hêsan riya dijwar tercîh dike? Mirov dikare van pîrsan zêde bike, lê pêwîst nake. Tiştê pêwîst bersivandina van pîrsan û li gorî wê fêmkirina armanca dewleta tirk e. Lewre heta mirov armaca rayedarên tirk fêm neke, mirov nikare berhingariya vî bike. Ew kes bi qedera gelên kurd û tirk dilîzin. Bi taybetî dixwazin civaka tirk li salên 1930'yî vegerin. Hêzeke ku li hemberî vî yekê li ber xwe bide li holê nîn e. Ji rewşên bîran bigire heta rayedarên rêxistinên karker û karmendan gelek kesan li pişt generalan di merasîmekê de ref girtiye. Ev merasîm ne ji xêrê re ye. Divê ev merasîm nebe merasîma hêvî û daxwaza gelan a bo aşî û azadiyê, bibe merasîma çete, dagirker û kedxwaran.

Roj bêtav namîne

Ferhengok

dawestîn: li ser piyan	(dönem)
sekinîn	pesname: mersiye
venandin: daçikandin	nexasim: bi taybetî, nemaze
nûrkirin: qatkirin	solîn/e: zeviya kulîlkan
lênandin: lêkirin	gildêma: gula berbirojê
pêdanandin: zeliqandin	hewîn: sebr, aram
rikirîn: ricifin	bû: dawet, dilan
lîrandin: lîlandin (zilgî)	bûçû: dûtûn alayî
xeriqîn: ji aliyê dîtbarî ve xira bûn	tolkirin: valakirin
pêjnkirin: hîskirin	berfende: aşî (çig)
jêgirtin: ahntî	nemrût: çirkîn, korkunç
dewrize: hespên mezin	arode: jina tolaz û geronek
berendam: aday	mandû: tiral, xilmaş
doz: dava, ûlkû	pêrayîbûn: ecibandin
karîger: faal, etkin	dewkil: meşk
karîgerî: bandor, tesîr	xwe-ewsartin: sermagirtin
mijûlbûn: pêdaketin (uğraşma)	karkêş: jêhatî, xebatkar
çêlikirin: behskirin, qalakirin	hespê sêw: yilki atî
fêrbûn: hînbûn, elimîn	sêwak: tolaz, konoz
kevnore: orf û adet	pelisandin: ufalamak
rûbar: çem (îrmak)	bişikbirin: bibîrbirin
giyan: ruh, derûn	lênîştin: lêsiwarbûn
jeng: pas	xarkirin: vemirandin, vêsandin
paçînî: paspal	xicilkirin: acizkirin
serdem: heyam	

NURETTİN BAHTIYAROĞLU

Roj ronahî ye, germî û kaniya jiyane ye. Ango roj giyanê dide her tiştî. Yek ji çar hemanên bingehîn ên afirandinê jî roj e anga agir e. Av, ax, ba, ar destpêka her tiştî ne. Tunekirina yekî ji van tunekirina jiyane ye. Zivistan demsaleke mirî tê hesibandin. Lewre di zivistanê de germî tune, tîna rojê kême û ax cemedê digire. Ax mirî ye, nikare jiyane biafirîne; av cemed e, nikare jiyane bide vejandin. Ji ber vî yekê giya hişk dibin, dar pelan diweşînin. Çûk li cihên germ digerin û ajal dikişin binê erdê. Zivistan mirina salê ye.

Mirina ku salê carekê tê bi biharê re cihê xwe dide vejîneke nû. Lewre tîna rojê xurt e, cemed bi tîna rojê dihele. Ax bi germa rojê sînga xwe ji jiyaneke nû re vedike. Gul û kulîlk dibîşkin. Ajal ji qulên xwe yê tarî dertên ser rûyê erdê. Mirin diguhere jiyaneke nû. Lewre kurdan 21'ê adarê wekî cejn pejirandine. Ji ber vî yekê ye ku kurd di her 21'ê adarê de cejna vejîne bi êgir pîroz dikin. Li serê çiyayên Kurdistanê, li deşt û newalan agirên gur tî

dadan û vejandina jiyane bi leztir dibe. Lewre agir ji mala tu kurdan kême nabe û nayê vemirandin.

Îro bo kurdan jî roj hilhatiye. Ev bîst sal e kurd xwe ji nû ve diafirînin û vedijînin. Kurdan roja xwe bi destê xwe afirandin û rojê jî kurd ji nû ve afirandin. Neyarên ku hetanî niha kurd di zivistanê reş û tarî de hiştibûn, baş dizanibûn ku

Kurdan roja xwe bi destê xwe afirandin û rojê jî kurd ji nû ve afirandin. Neyarên ku hetanî niha kurd di zivistanê reş û tarî de hiştibûn, baş dizanibûn ku hetanî roja kurdan bêtav neyê hiştin, ji bo wan mirin tune.

hetanî roja kurdan bêtav neyê hiştin, ji bo wan mirin tune. Ji ber vî yekê ye hewldanên wan tev li ser bêtavhiştina roja me ne. Bi vî baweriyê dest bi fen û fûtan dikin, çî ji destê wan tê dikin. Sûûqast, bombekirin, derxistina şerekî cihanê yê nû... Dixwazin her tiştî biceribînin û roja kurdan bêtav bihêlin.

Îro ne Newroz e, ne destpêka biharê ye jî. Lê îro kurd dîsa êgir vedixin û dixwazin tîna û şewqa rojê xurt bikin. Ji ber ku hinek

dixwazin roja me bêtav bihêlin. Lewre agir tîne gurkirin. Lewra agirê pîroz ne bi qirş û qalan û ne jî bi lastîk û êzingan tê vexistin. Îcar kurd agirê pîroz bi laşên xwe; bi laşên ku ji gemar û qirêja neyar hatiye paqijkirin, bi wan canên nazik û pîroz pêdixê... Mîna Zekiye... Başiyê naşewitîne agir, paqijî û baweriyê jî naşewitîne.

Agir zarokên xwe naşewitîne; bi destên keç û kurên xwe û wan digihîne roja pîroz. Wan bi rojê re dike yek. Dike pir di navbera rojê û Welatê Rojê de... Roj bi saya vî pîreyê digihêje heya kuncên reş û tarî, digihêje zarokên xwe.

Agir bû roj û roj kete dilê milyonan. Çî li zindanan, çî li çiyayên, çî li welêt û li der-

veyî welêt milyonan mirovan berê xwe daye roja xwe. Xwe bi agirê pîroz bi rojê ve girê didin û diqîrin: "Hûn nikarin roja me bêtav bihêlin." Heta ev bîr û bawerî, ev girêdana xurt hebe gelo roj bêtav dimîne? Wekî ku Popol Vuh gotiye: "Em dê tola mirinê hildin. Heta ku roja sibehê bibiriqê wê koka me tune nebe." Erê, heta roja li ezman bibiriqê û her kurdek bibe roj koka me naqele. Agirê dilê me venamire. Û wê kes nikaribe roja me bêtav bihêle.

Perwerdehî û hîndekarî

Ji mamosteyên wan bigire heta wezîrên wan hînî tişteki bûne: Yekîfî û bihevrebûna millî. Mêjiyê biçûk û mezinên wan bi vê jehrê hatiye şuştin. Ev heftê û pênc sal in ku gelê kurd û gelên me yên din bi zimanê tirkî perwerde dibin. Bi vê ramyariya pişafkar çend gav avêtine? Ji bilî xisar û dijminatîyê çî bi dest xistine? Bi vê ramana zengarî nehişt ku gelê kurd kurd bimîne û ne jî ev gel bû tirk.

Perwerdehî divê bi zimanê zikmakî be

Bi asayî çî mirovê ku ji dayik bibe, divê ku bi zimanê zikmakî, ango bi zimanê dayika xwe perwerde bibe. Lewre zarok hê di pitikiya xwe de hînî ziman dibe û ew ziman jî zimanê maderî ye û pir jî girîng e. Mirovek çiqasî mezin bibe û bê guhertin jî, dîsa ew dê bi zimanê xwe yê zikmakî bifikire. Nîgaşên (xeyalên) mirov, ramanên mirov ravekirin û axaftina mirov hemû bi zimanê mirov pêk tên. Ji ber vê yekê, gava ku mirov hînî xwendin û nivîsandinê bibe, divê ku mirov pêşî bi zimanê xwe perwerde bibe. Îro hemû pisporên navneteweyî yên hêvojkariyê û perwerdehiyê vê nêrinê diselmînin dikin. Ya herî rast jî ev e. Her zimanek rêz û rêçika wî ya taybet heye. Her zimanek bi taybetiyên xwe tê fêmkirin. Çilo ku her ajalek bi awayekî deng derdixe, her mirovek jî, li êrdima ku tê de dijî û di nava civaka xwe de bi zimanê xweser diaxive. Ew ziman dibe sedema xweparastina taybetiyên wî. Dibe sedema xwe naskirina wî.

Zaroka ku bi zimanê zikmakî perwerde nebe dê heta dawiya temenê xwe di nava nakokiyê de bijî. Dubendiya wî, dê bibe sedema bêkesayeti û jixwedûrketina wî. Çimkî dê fikir û ramanên wî bi zimanekî û perwerdeya wî jî bi zimanekî din be. Ger mirov pêşî çî zimanî hîn bibe, dê bi wî zimanî bifikire. Tiştê ku nibîhîstibe, gotinên ku berê bilêv kiribin, jê re pir biyan tên. Mirov jî tiştên biyan hez nake û tim jî tiştên biyan direve. Ev jî, ji hîndekarî û têgihîştinê re dibe astengeke mezin.

Îcar em werin ser ramyariya perwerdekariya KT'ê. Pêşî jî me got, mebest domandina pergala mêtîngeriye ye. Çi tişt û çî rê temenê mêtîngeriye dirêj bike, Komara Tirk dê wî tiştî xwedî bike û derxe pêş. Zanistî, şarezayî, xisletên taybet, hezkirin, demokrasi, yeksanî, rûmet, biratî û aştîyeke civakî jê re ne tiştên ew qas pêwîst in. Brevajîya wê, ew dixwaze mirov û mirovatiyê di nava xwîn, xwêdan û rondikên çavan de bifetisîne. Jê re, tenê tişteki pêwîst e: Berhevkirina kedê û alavên wê. Ji bilî wê her tişt jê re bêwateye û bînîrx e. Ger nêrin û nêzîktêdayîn bi vî awayî be, tu kes dikare behsa perwerdehî û hîndekariyek watedar bike?

Di hemû pirtûkên waneyan de nîjadperestîyeke çavrsor û dijminatîya gelan tişteki diyar e. Yekcar dibêje: "Ji bilî tirkan tu dostên tirkan nîn in." Li dîwarên hemû dibistanan gotineke din nivîsandî ye: "Vekirina dibistanekê, girtina hezar girtîgehên e." Kenê qijikan bi wan tê. Hejmara girtî-

gehên wan roj bi roj zêde dibe. Dibistanên wan jî hê qadên şer in. Hê ew bi potik û berstûkan mijûl dibin. Hê ew dikin ku mirovên 20-30 salî li gorî zagonan kincan wergirin. Hê ew di nava paşverûfî û kevneperestîyeke kesnedîfî de digevizin.

Perwerdekarî û hîndekarî wiha bi pêş ve diçe?

Gava ku mirov ji dût ve ango ji derve ve li pergala dibistan û zanîngehan temaşe dike, rewşa sazûmana dagirker bi her awayî û pir jî zêlal xwe dide der. Bi asayî tu kes jixweber nikare (ji ber xwe ve) cilekî nû ji zarokeke çar-pênc salî re bikire. Çima nikare? Çimkî dibe ku ew zarok wî cilê neecibîne. Neecibandina wî/wê jî tişteki pir watedar e. Ji ber ku ew zarok dixwaze serbixwe bijî û bi serê xwe biryar bide û dixwaze ku ew bi serê cilên xwe bi çavên xwe bibîne û bineqîne. Gava ku dê û bav an mezinên zarok, wî cilî bi zor pê bidine pejirandin, dê di kesayetiya zarok de texrîbatên pir mezin çêbibin. Yek, ew ê cil bê dilê xwe li xwe bike an li xwe nake. Dudo, zarok xwe bînîrx û bêvîn dibîne. Sê, êdî zarok bi dê û bavê xwe ewle nabe. Çar, inta zarok zêde dibe... Ev çend xisarên ku bi ser re hatine tespîtîkirin in.

Lê îro KT bi milyonan mirovan bi darê zorê û bi zagonên xwe yên zingar û kevnare mirovan jî binî de tune dipejirîne û bêyî vîn û daxwaza wan pişafînê pêk tîne. Dibistanên seretayî deynin aliyekî, di zanîngehên xwe de yektîp mirov, yektîp timtêl, yektîp raman û yektîp karmend, yektîp mamoste, yektîp bijîşk. hwd. diafirîne. Mebesta ku yekîfî û bihevreyî kiriye rêgez û li hemû platforman vê yekê tînin zimên. Ji mamosteyên wan bigire heta wezîrên wan; ji pisporên wan bigire heta hunermendên wan, bes hînî tişteki bûne: Yekîfî û bihevrebûna millî. Ji roja ku komar ava bûye û heta îro wan bi tenê ev dirûşme ji ber kiriye. Mêjiyê biçûk û mezinên wan bi vê jehrê hatiye şuştin. Ev heftê û pênc sal in ku gelê kurd û gelên me yên din bi zimanê tirkî perwerde dibin. Bi vê ramyariya pişafkar çend gav avêtine? Ji bilî xisar û dijminatîyê çî bi dest xistine? Bi vê ramana zengarî nehişt gelê kurd kurd bimîne û ne jî ev gel bû tirk.



Dewleta tirk dibêje, bo girtina girtîgehekê dibistanekê vekin. Lê hejmara girtîgehên wan roj bi roj zêde dibin.

Heke mirovekî xirûfî rabe bibêje: "Dengê dik bi min ne xweş e. Divê ku ez vî dikî wekî bilbilî perwerde bikim û bila wekî bibilan her sibe ji min re bixwîne". Dê ev mirov çiqasî bi ser bixwe? Carekê dik nabe bilbil, çimkî cîsnê wan ne yek e. Dê dik ji dîkbûna xwe bibe û nema dikare dîkîtiyê bike. Dê ev kar bibe sedem ku dem vik û vala derbas bibe.

Ger berpirsiyar û pisporên perwerdehiyê ji dilê xwe û bi nêrin û nêzîktêdayînên erênî nêzîkî kêşeyê bibin û şagirtên xwe bi fikir û ramanên erênî bigihînin, dibe ku ji bo pêserojê gavên girîng bîne avêtin. Çimkî perwerdehî ne tişteki hîndekarî bihêztir û xurtir e. Lê belê ku perwerdehî di bin fermana artêşa leşkerî de be û artêş jî di fermana mêtîngeriye de be, tu wateya perwerdehiyê û girîngtiya wê namîne. Jixwe perwerdehiyeke bi vî şeweyî bi mêjiyekî leşkerî û êrîşkar tê dirûvandin. Gotina dawî "ger ku mirov li gorî mercan teşe bigire, divê ku mirov li gorî mirovahiyê teşe bide mercan. (Qediya)

Rêzîmanê kurmancî

SAMÎ BERBANG

- Wane 38 -

Kevanek

Agahiyên ku cih girtina wan di nava hevokê de ji sedî sed pêwîst nîn e, di nava kevanekê de tîn dayin. Bi derxistina van agahiyên tiştek ji hevokê kêmtir nabe. Dema mirov nexwaze hevokê zêde dirêj bibe jî, mirov beşeke hevokê dikare bixe nava kevanekê û bi vî awayî jî hevokê siviktir û herikbartir bike. Di cihê kevanekê de hin caran dubendek jî tê bikaranîn. Bi taybetî di zimanê ewrûpî de ew dubendek jî kevanekê zêdetir tîn bikaranîn. Her wiha di nava kevanekê de mirov dikare hemwateya peyvekê ku zêde nayê zanîn jî bide. Bo vî nîşaneyê, mirov dikare van mînakên bide:

Heval, duh serê sibê (bi hilatîna rojê re) ji malê derketin.

Geliyê Zapê (ku îro bûye warê gerîla) cihekî gelekî xweş e.

Heval Zozan (ku sê salan şervanî kiriye) duh ji girtîgehê derket.

Xwişka min Eysan (bûka çil rojê) hatiye zê. Dêrdê mezin (ixanet) nahêle ku yekîti pêk were.

Komek mirov (nêzî sih kesî) bi hev re çûne bajêr.

Di mehên payizê de (rezber, kewçêr û sermawez) pelên daran diweşin.

Meha avrêlê (nîsan) meheke biharê ye. Wateya vî tiştê nehênî (derzagonî) diyar e.

Dunik

Dema mirov gotinekê ji devê yekî din bigire an jî neqil bike, mirov wê gotinê di nava dunikê (turnak) de nîşan dide. Her wiha diyalog jî heke bi bendikê neyê nîşandayîn, dikeve nava dunikê. Disa peyveke ku ji bilî wateya xwe ya bingehîn wekî nav hatibe nîşandayîn, di nava dunikê de tîn nivîsîn.

Pêşiyên me gotine: "Rih dibe bihust, dijmin nabe dost."

Elî got: "Ez dê sibe werim malê." Kovara "Avaşin" li Swêdê derdikave.

Her kes dizane ku "dara azadiyê bi xwîna xudan tîn avdan."

Celadet Bedirxan gotiye: "Gramer tevahiya qeydeyên rastaxaftin û rastnivîsandina zimên e."

Xêzek

Gava gotûbêj di navbera çend kesan de çêdibe, heke gotina yekî/ê di nava dunikê de neyê nîşandayîn, xêzekê datînin ber gotina mirovî/ê.

Cîgerxwîn ji bavê xwe re got:

- Bavo tu yê kengî herî welêt.

Bavê lê vegerand:

- Di nêzîktirîn demê de ez dê herim.

Du mirov ketin nava gotûbêjê, yekî got:

- Siyadîyê sibê li te bixe.

Yê din got:

- Heke ez zû rabûm, bila li min bixe.

Bangnîşan

Mirov bixwaze hesteke bilind (çoş, xem, tirs û xof) nîşan bide, mirov bangnîşanekê dide ber. Her wekî diyar e, mirov bangnîşanê datîne ber hevoka baneşanê.

Ax dilo!

Dilo yeman!

Hey gidî!

Ax! derdê me çiqas giran e.

Hawar ey hawar!

Wî! ez lewitandim.

Hiş be kuro! bila kes nebihîze.

Hevalno!

De zû were! em herin.

Tew! Te jî xweş nivîsî.

Erik! te çi dereweke mezin kir.

Wa! bi rastî wisa ye

Bendek

Ev nîşan dikeve navbera du bêjeyên ku di navbera wan de hogirî heye. Her wiha gava peyvek jî ber ku di rêzê de bi cih nabe, ji hev bê qutkirin, bendekê

datînin dawîya rêzê. Wekî tîbînyekê divê em bi bîr bixin ku peyv kîte bi kîte tê parçekirin. Mirov nikare kîteyê parçe bike. Her wiha gava mirov hêmanên peyvekê nîşan dide, mirov bendekê dixê navbera du hêmanan. Disa heke qertaf bîn nîşandayîn, heke ji kîjan alî ve bi peyvê ve bibe mirov bendekê datîne wî aliyê qertafê.

Du-sê mirov hatin û li te pirsîn.

Mîrê Botan Bedir-Xan Beg li hemberî neyaran serî rakir.

Qertafa /bi-/ rengê fermanê dide hevokê.

Di zimanê me de hinek paşgir hene ku ji navdêr û rengdêran lêker çêdikin /-andin/ yek ji wan e.

Mirov dikare peyva hilweşandin wiha dahûrîne: Hil-weş-andin

Lê vekitandina vê peyvê bi awayekî din e. Heke mirov bixwaze wê vekitîne di wisa be: Hil-we-şan-din.

Sêxal

Dema mirov bixwaze bide zanîn ku hevok neqediya ye, wê demê mirov sêxalê datîne dawîya hevokê, her wiha heke ji nava gotina yekî din tiştek hatibe derxistin, wê gavê jî mirov bi sêxala di nava kevanekê de dide zanîn ku ew jêgirtin ne tam e.

Ez ê werim û ...

Ehmedê Xanî dibêje:

"Ev meywe (...) ne avdar e

Kurdmançî ye ev qeder li kar e"

Pêxwasiya li dijî kurdan

MAHMUT KILINÇ



Neyariya li dijî kurdan a desthilatiya Tirkiyeyê ji demazirandina Komara Tirkî heta îro, heger carinan kêmtir û zêde bûbe jî, di nav politîkayên dewletê yê veşarî û eşkere de her dem bûye xwediyê cihekî taybet. Dewletek çawa di nav ev qas salan de di warê hiqûq, demokrasî û mafên mirovan de xwe naguhere? Heftê sal berî niha dewlet ji bo me kurdan çî be, îro jî ew e. Her ku dem derbas dibe mirov dibêje qey zordestî wê kêmtir bibe, lê mixabin hê jî zêde dibe. Her çiqas li gelek deran şer û nakokî hebin jî, bi giştî di nav heyama demokrasî û aştiyê de ye. Axaftinên siyasetmedar, berpîrsên civak û dewletan bi şeweyekî diplomatîk diqewimin û ji pêxwasiyê jî dûr in. Rastiya Tirkiyeyê jî dijberî vê yekê ye.

Ew pêxwasiya vê meha dawîn qey we tu caran dîtibû? "Hemû deriyan li me digirin!", "Dinyayê li me teng dikin!" Bi hemû amûrên xwe yê ragihandinê êrîşeke gelekî tund li ser tîkoşîna neteweyî ya gelê kurd dimeşînin. Gîraniya xwe dane ser şerê psikolojîk. Jixwe ji

mêj ve di şerê psikolojîk de pispor in. Di dirokê de gelek mînak hene ku bi zext û êrîşên psikolojîk li ser civakê bandora xwe ya tarî bi awayekî xeternak bi cih kirine.

Heger mirov li axaftinên siyasetmedarên tirk binêre, bi çapemeniya tirkî bawer be, tîkoşîna neteweyî bi giştî tîk çûye! Jixwe dewleta tirk li hemberî tîkoşîna neteweyî ji bo serkeftina xwe bi qasî êrîşên leşkerî propoganda û ajîstasyonê jî pêwîst dibîne. Li meydana, di salonan de dest bi axaftinên pêxwasiyê kirine. Şeweyê ku ew bi kar tînin yê kuçe û kolanan e. Kesên ku li bajaran jiyane, dengê ku ji wan derdikave dinasin; dizanin ku di kuçe û kolanan de gelek pêxwas dengên wisa derdixin.

Gelekî balkêş e ku ji şeweyekî normal dûr ketine. Dijmîni jî ne bêdebb û hudûd e. Her wiha peymanên navneteweyî hem ji bo şer, hem jî ji bo aştiyê hinek rêz û rêçik danîne. Ev rêz û rêçik, bi giştî bûne hiqûqa navneteweyî. Dewlet û civatên ku pesnê xwe bi hiqûq û demokrasîyê didin, sazûmana wan li ser vî hiqûqê rûniştîye. Lê belê desthilatdariya tirk jî hemû rêz û rêçikan der e. Pîrî caran êrîşên rayedarên dewleta tirk ji edeb û hidûd derdikewin. Bala xwe bidin Serokwezîrê Tirkiyeyê Mesut Yılmaz, di axaftinên xwe de tu rêz û rêçikan nade ber çavên xwe. Belê neyartiya Yılmaz a li dijî kurdan, em dizanin ku ji ya rayedarên din ne kêmtir e. Ez bawer im ku hinek mirov jî li tûjiya axaftinên wî dinêrin, ji xwe dipirsîn: Çima ew qas zêde ye?

Dijmîniya Yılmaz a li dijî tîkoşîna kurdan bi hinek bûyerên din ên ku vî dawiyê eşkere dibin ve girêdayî ye. Her ku bi bazirganekî narkotîk re, bi kujer û dizekî re axaftinên wî bi kasetan eşkere dibin, kesên ku li derdora Yılmaz jî van sûcan berpîrs tîn dîtî, heta bêhna gemarî digihêje wî, ew pêxwasiya xwe zêdetir derdixîne pêş. Ew, hewldana veşartina pîsî û pasîkê ye. Êdî êrîşên ku li dijî tîkoşîna kurdan pêk tîn li ser hesabê politîkayên hundir in. Yılmaz, her ku dikeve tengasiyê bêhtir êrîşan tîne ser kurdan û civaka tirkî jî li dijî kurdan tûj dike. Ev helwest gelekî bixetere ye.

Bi êrîşa li ser kurdan, bi kuştina ciwanên kurdan rayedarên dewleta tirk, li aliyekî partî û politîkayên xwe dimeşînin, li aliyê din jî kîsîkê xwe dadigirin. Çend salan berî niha heger bigotana, Yılmaz bi çeteyan re tîkildar e, çend kesan ji wan gotinan bawer dikir? Lê îro her roj pêwendiyê gemarî eşkere dibe û em hemû dibînin ku ew siyasetvanên ku hinek kesan paqij dizanin, di nav gemariyê de digevîzin. Bi êrîşên psikolojîk tîkoşîna neteweyî tîk naçe. Quweta wan nagihêje ku "li ber me hemû deriyan bigirin." Ji wan zêdetir derî, îro jî bo kurdan vekirî ne. Ferqa di navbera me de yek e: Ew "dewlet in" em ne dewlet in.

Gelê kurd tîkoşîna tîkoşîna neteweyî ji mejiyê xwe, ji jiyana xwe derxistîye. Tîkçûnê edî tune ye. Dereng dibe, zirar nabe û hinek pîrsgirêkên leşkerî dibin û her wiha hinek pîrsgirêkên civakî û tevgerî dibin, lê tîkçûn, belavbûn tune ye.

Rêwiyê riya kurt û herî dirêj:

Gava mirov dost an hevalekî xwe yê gelek nan û xwê pê re xwaribe winda dike, gelek rengên dinayayê li ber çavê wî dixeriqin. Lê tiştên girîng û dilê mirov xweş, kesera wî kêr dike, rengê çûyînê ye. Gava ku çûyîn li ser riya azadiya wî kesî be û wî kesî bi dil dabe ser wê riyê, ji mirovê di şûn de re jî, tenê birêkirin dimîne.

Servet Denli

Ev sê roj bûn li ser goristana Wêranşarê dewletê serî li malbatan digeland. Mirov, tîmên taybet, leşkeran pê li meytên şervanên Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê dikirin ku bi saxî, mirov fedî dikir li bejn û bala wan binêre. Li aliyekî dewletê leşker reşandibû, li aliyê din gel, xwe li goristana diqewimand. Me ax vedîda, qudûm şkestî, çong difisiyan li me. Hêdî hêdî meytek, yekî din, yekî din...derdiket. Mirov bawer nedikir ku çawa bêhn têkeve laşên van ciwanan. Ji bir bûbû ku ev jî zindî bûn.

Dest û ling her ku diçû pûç dibûn, hew li ser lingan disekinîn. Bi rakirina meyt re, ez nizanim çi qewimî li ezmanê giyana min; xwîn li rehê canê min vegeheriya û heft pakrewan vejiyabûn li ber çavên min. Bi sedan jinan dilîlandin, bi hezaran mirovan li çepikan dixist. Ez bi ser xwe ve hatibûm, leşkerên dijmin şerpeze bûbûn...

Gava mirov dost an hevalekî xwe yê gelek nan û xwê pê re xwaribe winda dike, bi rastî, dinya li ber

çavên wî tê guhartin, gelek rengên wê dixeriqin. Êdî ne ew, ne dinya, ne yên berê ne. Xwe tenê dibîne û li xwe digere. Kesera wî ya ji bo kesên çûyî, ji bo wî bi xwe ye. Di nav kesera xwe de, hêdî hêdî biyanî dibe ji dinyayê re. Piştî şerpezetî, xof û xemgîniya pêşîn, hişên wî tîn serî û difikire ku ew jî dê zû an dereng here. Lê tiştên girîng û dilê mirov xweş, kesera wî kêr dike, rengê çûyînê ye. Û di dawîya dawîn de, gava ku çûyîn li ser riya azadiya wî kesî be û wî kesî bi dil dabe ser wê riyê, ji mirovê di şûn de re jî, tenê birêkirin dimîne. Rûmeta çûyînê tê fêmkirin wê çaxê.

Kesên ku didin ser vê riya "kurt û herî dirêj", kesên ku ji herkesî bêhtir hezkiriyên jiyanê ne wekî ku di vê peyva "em qasî ku xwe di riya wê de bidin kuştin, ji jiyanê hez dikin" tê zimên.

Servet Denli, sala 1974'an de li gundê Qesra Qenco hate dinyayê. Di zarokatiya xwe de qet li derekê nedisekinî, dest biavête çî, dibir serî. Li gund û bajêr, xwe bi mirovan dabû hezkirin, têkiliya wî bi civatê re germ bû. Pir bi henek, qerf û



qotikan emel dikir. Tim çav li tiştê mezin bû.

Dibistana seratayî li gundê Qoserê, li Diêmê qedand. Dibistana navîn li Qoserê qedand. Du salan li


lîseya Qoserê û gundên wê xebitî. Di serê Reşemiya 1992'an de tevî refên Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistan bû.

Di salên dibistana navîn û lîseyê de gelek pirtûkên civakî, derûnî û dîrokî dixwendin. Bi rastî li ser derûnî û têkiliyên navbera mirovan de pîspor dihate hisêb. Bandora zanîna wî gelekî li ser şervantiya wî çêbû. Di jiyana xwe ya gerîlatiyê de li nav gel pir xebitî. Li hemberî kevneperestên xwecihî gelek xebata siyasî û leşkerî kir. Gelek eşîr û malbat li hev anîn li wê herêmê. Her kesî berî navê wî yê gerîlatî ew bi navê "Hevalê Devliken" nas dikir. Bi qasî devlikentiya xwe mirovekî dijar û zana bû. Dest biavêta çî, li gorî qanûna wî tiştî dimeşîya. Carekê ev ji min re gotibû: "Heval, ku ev sal û nîveke ez li herêma GAP'ê sax mabim, ji ber ku ez prensîbê Partiyê pêk tinim, sax im." Piştî wê demê bi 5-6 mehan ew tevî şer hevalên xwe li herêma Wêranşarê, di 8'ê Kewçera 1993'an de tevî karwanê pakrewanan bû.

*Carina
Carina
Roj sar dimîne
Havîn dirikrike ji serma
Bihar qet nalirîne
Bargiraniyek dikeve ser laşê mirov*

*Dil bedenê
Beden dil
Tahmûl nake*

(Cemîl Denlî)




□ 18 sermawez 1937:

Seyid Riza û hevalên wî hatin dardekirin

Piştî Serhildana Dêrsimê, waliyê bajarê Erzinganê qasidek şand di Seyid Riza û got ku hukumeta Enqereyê hemû daxwazên we qebûl dike, ji ber vê yekê artêşê şer rawestandiyê.

Seyid Riza jî bi van gotinan bawer kir û bi heyeta xwe re çûn Erzinganê lê artêşa tirk ew girtin û şandin bajarê Mazrayê.

Serokê Serhildana Dêrsimê Seyid Riza li wir roja 18'yê sermawezê jî aliyê dewleta tirk ve, bi riya dardekirinê hatin qetilkirin.

BÛYERINE JI DÎROKÊ

□ 15.11.1918:

Peymana Sewrê hate îmzekirin

Piştî Şerê Cihanê yê Yekemîn, ji dawîlanîna şer, li bajarê Swisreyê Servesê peymana Sewrê hate îmzekirin.

Vê peymanê bi her awayî Almaniya Împaratoriya Osmanî dixiste bin gelek barên giran.

Li gorî vê peymanê erdê Osmaniyan li welatên serkeftî dihat parvekirin. Her wiha di peymanê de qala otonomî û serxwebûna kurdan jî dihat kirin.

Bi xatirê te diwaroj merheba kemalîzm



Navê film: Bi xatirê te diwaroj (Hoşçakal Yarın)

Derhêner: Reis

Çelik

Lîstikvan:

Berhan Şimşek,

Tuncel Kurtiz,

Tuncer

Necmioğlu

Derhêner Reis Çelik bi bûyerên ku ji filmên xwe re dike mijar balê dikişîne ser xwe. Bûyerên ku dineqîne, dibin sedema dengvedana film. Lê ev helwest bi xwe re gelek gelemşeyan jî tîne. Ev bûyer di dil û mêjiyê mirovan de pir jîndar in. Lewre jî zanînekê kûr û helwesteke zelal dixwazin. Ji ber nebûna vê yekê, berhemên Çelik bi qasî mijara ku hildaye dest dêhna mirov nakêşin. Bo nimûne, Çelik bi filmê "Işıklar Sönmesin" dest avêtibû şerê li Kurdistanê. Lê di derpêşkirina kakilê mijarê de serkeftî nehate dîtin. Lewre gerîlayên ku gelê kurd her roj di MED-TV'yê de bi çavên serê xwe dibîne, bi awayekî wisa hatibû şayesandin ku kenê miriyan pê dihat.

Niha jî bi filmê "Hoşçakal Yarın (Bi xatirê te diwaroj)" bûyerek dîrokî hildaye dest. Di vî filmî de jî li ser darvekirina sê ciwanên şoreşger: Deniz Gezmiş, Yusuf Arslan, Hüseyin İnan hatiye rawestandî. Lê mixabin ev film jî zêde serkeftî xuya nake. Bi taybetî kesên ku bûyerên wê demê jiyane an jî li ser wê, pirtûkên ku derketine xwendine, bi dilekî sar û hêviyeke şikestî ji sînamayê derdikevin.

Filmek divê pêşî di afirandina atmosfera heyamê de serkeftî be; karibe temaşekar bigire bin bandora xwe. Lê mirov nikare di filmê navborî de jiyana wê demê hest bike. Mirov xwe li hemberî bûyereke pêkenokî hest dike.

Li aliyê din, neqandina kesên ku rol hilgirtine ser xwe jî gelekî girîng e. Divê ew kes û kesên di bûyerê de, ne tenê bi dirûvê xwe, lê bi hest û ramanên xwe jî li hev bînin. Xuya ye ku jîndarkirina kesekî wekî Deniz Gezmiş ku di çavê gelek mirovan de wekî efsaneyekê ye, diwar e. Lê Berhan Şimşek her wekî çawa nikaribû hest û ramanên gerîlayekî kurd bide der, nekariye hest û ramanên Deniz jî bide der. Tê zanîn ku her sê ciwan jî ji nîşkekî ne, di çaxa hev de ne. Lê di

film de Hüseyin wekî zarokê xuya dike, li aliyê din Deniz û Yusuf navserê ne.

Dişa tê zanîn ku Hüseyin teorîsyenê THKO ye û pirtûka bi navê "Türkiye Devriminin Yolu" ku wekî manifestoya THKO tê nasîn, ji hêla wî ve hatiye nivîsîn, lê mixabin ev yek di film de diyar nabe. Ji bilî parêzer (Tuncer Necmioğlu) û jina wî Şekîbe, listikvanek jî di rola xwe de bi ser neketiye. Listikvan Tuncel Kurtiz ku rola Ali Elverdi girtiye ser xwe jî serî ji yê din girtiye. Ali Elverdi wekî mirovekî dilovan hatiye pêşkêşkirin.

Di dadgehê de Hüseyin İnan dibêje: "Me xwest em bo gel bibin çirûska hêviyê". Lê mirovên ku li vî filmî temaşê bikin, dê zêde hêvîdar nebin. Têkiliya tevgerên wê demê ji hev hatiye qutkirin, qet qala bûyera Kızıldereyê ku bo rizgarkirina Deniz û hevalên wî pêk hatibû û tevgera İbrahim Kaypakkaya nayê kirin.

Her wiha di film de bo îro tu peyama erênî nîn e. Divê neyê jîbîrkirin ku doza Deniz, Hüseyin, Yusuf li Nûrheqa ku xwîna Sinan û hevalên wî lê hate rijandin, doza Mahir Çayan û hevalên wî li Kızıldereyê ku ew lê hatin kuştin û doza İbrahim Kaypakkaya li Çiyayê Munzur ku wî lê tevgera gerîla da destpêkirin ji hêla Tevgera Azadiyê ve tê meşandin.

Di film de kemalîstiya endamên THKO'yê zêde derketiye pêş. Di nava bi hezaran şoreşger û welatparêzan de kemalîstekî mîna Bedri Baykam û Serokê Belediyeya Esenyurtê Gürbüz Çapan ku ji CHP'ê ye, li mîrasa wan xwedî derdikevin. Bi vî awayî jî ya dilê derhêner çî dibe ew zane, film wekî parçeyekî kampanyaya kemalîstan ku piştî 28'ê reşemiyê dest pê kiriye, xuya dike. Tê xwestin ku tevgera ciwanên şoreşger di nava sînorê rejîmê de bê pejirandin.

S. BERBEYAN /STENBOL

ÇAVDÊRÎ**Du gotin...!**

SERKAN BRÛSK

Peyvek pêşiyên me heye û di nav gel de pir tê gotin û wek hemû gotinên pêşyan tîra xwe bi nîrx, bi ders e. Ger ez ne şaş bim, çirokeke ve galgalê jî heye.

"Çi kiro bi xwe kiro; qencî kiro bi xwe kiro, xerabî kiro bi xwe kiro." Exlebe ev peyv wek şîretê li kesên ku berê wan li xerabiyê ye, tê kirin. Min ev peyv ji bo çî bi bir anî û di serê gotara xwe de danî. De ka hinekî di rewşa dewleta tirk bifikirin. Tenê di halê wê yê van rojan de bifirîkin û bi çavên xwe lê temaşê bikin. Hûn dê bibînin, bê çawa wan bi destê xwe bager û firtona xerabiyê li xwe rakirin û cihan li xwe teng kirin. Wan xwest xerabiyê bi tevgera rizgariya gelê kurd û cîranên xwe bikin, lê hesabê wan ê malê û sükê li hev derneket. Wan xwest dinyayê li ser serê me û hinek ereban bikin tara bêjîngê, lê ew di bin toza bêjîngê de man.

Wekî mînak, wa ye Sûrî wek xwe û li cihê xwe ye. Ne guhertinên siyasî û ne jî yê wekî din li wê çêbûne. Heta rewşa wê jî berê baştir e, îro. Ji ber ku hemû dewletên ereban paşmêriya wê kirin û eşkere gotin ku ew li piştê wê ne. Tirk çî dibêjin bila bibêjin wan kevirê xwe di ber xwe re berdan. Ew jî Kibriseke din tirsîyan. Vê helwesta xerab a dewleta tirkan kir ku doza me li hundir û li derve bi lez û bez belav bibe. Bi awayekî mayinde bikeve rojeva cihanê. Biryara Duma, îspata vê îdiayê ye. Ji vê xuya dike bê serê tirkan li kîjan tahtê ketiye. Mirov bi asanî dikare bibêjêku ew xas e peyvên çort û xerab îro li wan vedigerin.

Min, bi meseleyek pêşyan dest bi gotarê kiribû, ez bi meseleyeke şoreşê jî berdeham bikim. Rojekê leşker dora gundekî digirin. Gund xwedî gerîla û şehîd e. Ji ber ku şopa gerîla jî ser gundiyan qut nabe, şênî tîra xwe polîtîze bûne. Çarçoveya nîqaşên wan carinan jî ya bajariyan jî firehtir dibe. Ev jî pir caran gelekî ne bi dilê wan e. Bi gotina kurdên sükî, êdî gotin bi şênîya vî gundî re nabe. Ew di bin gotinan de namînin û li bersiva xwe jî nahevirin. Dema zimanê wan digere nema zû bi zû disekine. Neûzûbîleh ê ku têkeve devê wan, nema kare xwe rizgar bike. Tu xwe bi ribkê bifiroşî wan, tu nema karî xwe jî wan bi zêran bikirî. Herdu piyên mirov dikin soleke teng û mirov paşûpê ve li kerê siwar dikin.

Helbet ne tenê sükî bi vê rewşa gundiyan vî gundî dizanin, her wiha dijmîn jî, vê yekê baş zane. Bi fereca sibê re komitan li pêş, davêjin ser gund, dikevin malan û gundiyan li pêşiya gund didin hev.

Lê komitan rast diajo ber devê deriyê dayika şervanê azadiyê. Temenê dayikê li dora heftêyî ye. Tirkî li sorgonê fêr bûye. Û tiriyeke ne gelekî xerab dike. Dema serfermandar pê dihesa ku dapîr bi tirkî dizane. Pêşî bi edeb dipeyve lê du re hin gotinên nelirê dibêje. Dapîr wiha li fermandar vedigerîne: "Peyvên te li vê malê digerin, tu kesî layiqî xwe nabînin, berepaş li xwediyê xwe vedigerin." Serfermandarê tirk li himberî vî rabûnê diheyre. Ew pêşî difikire. Serê xwe berdide ber xwe bê his û pis paş de wek kûçikê ku şiv li pozê wî ketibe dikişe.

Gotina pêşiya û bersiva dayika gerîla, ji bo dewletê, yek tiştî dibêje, dewlet çî dike bi xwe dike. Ji ber ku yê xerabiyê, talaniyê, çavsoriyê, çewşineriyê û kuştinê dike, ew bi xwe ye, û malûm e ku ev hemû tîne pêşiya wê. "Tu çî biçînî, tu dê wê biçînî" Dewleta tirk jî dijmînatîyê pê ve heta niha tiştêk din neçandiye. Ev heftê û pênc sal in ku her bizrê dijmînatîyê diavêje xakê û heman berhemê jî, hiltîne.

Parlementera PDS'ê ya Ewropayê Min divê dengê doza kurdan

Doza min a ji bo endamtiya Parlamentoya Ewropayê li ser doza kurdan e. Min dil heye ez dengê doza gelê xwe hîn bilindtir bigihînim raya giştî ya cihanê û problemên li welatê xwe bînim rojeva cihanê, da ku kêlîke berî kêlîke bêne çareserkin. Lewre mirovek bêgel û welatê xwe ne tu tişt e.

Gelo ji ber çi we heya îro Kurdistan nedîtîye?

□ Mixabin ez 22 salî me û qet neçûme welêt. Min dixwest tevahiya Kurdistanê, bi taybetî paytexta Kurdistanê Amedê bibînim. Em dê li pêşerojê lê bixebitin da ku em Kurdistanê bibînin. Em li vir di nava dibistanê de, bi riya rojnameyan bi siyaseta dinyayê re mijûl dibin.

Rewşa welêt?

□ Bêguman êdî rewşa welêt jî bi vî awayî piçekî bala mirov dikişîne. Mirov dixwaze piçekî der barê siyaseta de dest bi xebatê bike. Me cihê xwe di nava partiyêke alman de girt. Di vî hîlbijartina ku 27 rezberê de hate çêkirin de, em Partiya Demokratê Sosyalîstên Alman PDS bi ser ket. Min di nava Parlamentoya Eyaleta Bakur de cih girt. Îro jî em lê dixebitin ku bikevin Parlamentoya Ewropayê.

Baş e. Ji bo vê yekê çi xebatên hene?

□ Wekî tê zanîn em aniha amadehiya civînên xwe dikin. Her partî dema hîlbijartin çêbin, lîsteya endamên xwe yê Parlamentoya Ewropayê diyar dike. Peyre kongreyekê pêk tîne û lîsteya endaman ji bo hemû endamên partiyê radi-gihîne. Lê beriya kongreyê partî civînekê girêdide û kesên berendam dide xuyakirin û peyre jî yê ku dil dikin di kongreyê de xwe wekî endam didin pêş. Piştî vî yekê li navenda partiyê û şaxên we xebat dest pê dike. Di vî navberê de em hinekî propagandaya xwe jî dikin. Niha em wekî PDS'ê projeyê nû amade dikin. Armanca me ew e ku vî projeyê li hemû şaxên partiyê bidin nîqaşkirin.

Doza min ya ji bo endamtiya Parlamentoya Ewropayê li ser doza kurdan e. Min dil heye ez dengê doza gelê xwe hîn bilindtir bigihînim raya giştî ya cihanê û problemên li welatê xwe bînim rojeva cihanê, da ku kêlî berî kêlîke bêne çareserkin. Lewre mirovek bêgel û welatê xwe ne tu tişt e. Ji bo vê yekê em dê her dem ji bo gelê xwe xebatê bikin û di xizmeta gelê xwe de bin.

Di hîlbijartinê de helwesta kurdan ji bo we çawa bû?

□ Bi taybetî di vî hîlbijartinê de alîkariyêke mezin bo me hate kirin. Li tevahiya Almaniyayê ji hemû alîyan ve kesên ku biyanî bûn; kurd, yewnan û gelên din

piştgiriya me kir. Dema mirov biyanî be û xebatê bike, pir bala kesên biyanî dikişîne. Bi rastî ez bi xwe kurd im, lê bawer nakim ku kurdek bikaribe li Ewropayê bi dilê xwe bijî. Ji ber ku dil û guhê mirov bi her awayî li ser welêt e. Bi rastî mirov bi vî şerî ku tê meşandin gelekî hişyar in. Lê mirov pê diêşe jî, lewre divê em serê xwe pê biçînin. Te rastî divê, mirov dixwaze kêlîke berî kêlîke şerê li Kurdistanê bi dawî be û em li welatê xwe azad û serbixwe bijîn.

We di vî temenê ciwan de ji ber çi pêwîstiya karûbarê siyasî dît?

□ Dema li welatê mirov şerekî qirêj hebe, her tiştê wî gelê qedexa be û bi hezaran ciwan canê xwe bidin, bivê nevwê mirov li ber van dikeve. Lewre mirov dibêje pêwîst e mi-

rov rêça wan bişopîne. Li aliyê din ger neteweyêke xwêdî şêniyêke 40 milyon kesî bindest be, ev yek pir bala mirovan dikişîne. Ji ber vê yekê mirov dixwaze li Ewropayê ji bo vî gelî xebatê bike û bi ser bikeve.

Em dikarin bi bêjin ji hemû deman bêhtir niha politîka ji bo ciwanên kurd re pêwîst e?

□ Belê. Gelek gelek pêwîst e. Mirov mecbûr e. Ne tenê ez, banga min ji bo hemû ciwanên kurd, bi taybetî ji ciwanên êzîdî, heye. Bila xwe di nava tekoşinê de birêxistin bikin. Bila xwe zane bikin, da ku bi ser bikevin. Ger mirov bi zanabûn xebatê neke, azadbûn jî dijwar û zehmet e.

Hûn wekî kurdeke siyaseta Alman-


yayê ya li ser kurdan çawa dinirxînin?

□ Dema mirov bi xwe kurd be, li Almaniyayê hatibe dinê û di nava jiyana Ewropayê de bijî, bi rastî mirov berî her tiştî welatê xwe tîne bîra xwe. Dema me di nava PDS'ê de dest avêt karê siyaseta, daxwaza me ew bû ku em bikaribin dengê Kurdistanê, dengê gelê xwe ragihînin tevahiya cihanê.

Baş e. Dema tu bi karûbarê siyasî rabûyî, helwesta malbata te çawa bû?

□ Malbata min ji destpêkê heya îro gelekî alîkariya min kir. Ne tenê malbata min, xwedî û dostên me jî, bi rastî moralala me geş dikin. Em bi vî piştgiriya wan pir kêfxweş dibin û bêhtir destên xwe dirêj xebatê dikin. Em dixwazin ku xebata me bi ser bikeve.

Felek Uca di hîlbijartina giştî ya li Almaniyayê, ku îsal 27'ê rezberê de saz bû, li ser navê Partiya Demokrat ya Sosyalîst PDS bû endamê Parlamentoya Eyaleta Bakur. Uca ev 22 sal in li Almaniyayê ye û her wiha endama Yekîtiya Êzîdiyên Kurdistanê ye.



Têkoşina neteweya kurd ya ji bo azadiyê ji her kesî bêhtir ji bo jinan bikêr û girîng e. Lewre jinên kurd bi hêzeke xurt û mezin pala xwe dan Tevgera Azadiyê. Vê yekê bandoreke mezin û karîger li jinên kurd kir. Li aliyê din tesîra Tevgera Azadiyê li dûrî qada şer li Ewropayê jî li jinên kurd bû. Ji ber vê yekê mirov dixwaze li Ewropayê bi karûbarê siyasî rabûn. Ji van jinan yek jî Felek Uca ye. Felek Uca, îsal di hîlbijartina giştî ya Almaniyayê de, ku li me rezberê saz bû, li ser navê Partiya Demokrat a Sosyalîst PDS'ê di Parlamentoya Eyaleta Bakur cih girt. Ew, her wiha endama navendî ya Yekîtiya Êzîdiyên Kurdistanê YÊK'ê ye.

Felek Uca xwe wiha dide nasîn: "Ez bîst û du salî me. Li welatê Almaniyayê li bajarê Celleyê ji dayik bûm. Di binyata xwe de ez ji Batmanê ji Bîstê me. Heya îro ez qet neçûme welêt, min welat bi çavê serê xwe jî nedîtîye. Ez 11 salan çûme dibistana almanan piştê min dest bi xwendina Emelê Etîstatî kir. Niha jî ez Radyolojiya Etîstatî dixwînim peyre jî dixwazim Polîtolojiyê bixwînim."

Heta Bakur Felek Uca: dan berztir bikim

We 11 salan li Almanyayê xwend, sîstema perwerdehiyê ji bo biyaniyan çawa ye?

● Li Almanyayê her mirov xwendî mafê perwerdehiyê ye. Her kes dikare li ser hemû waran li zanîngehê bixwîne.

Me hay jê heye, li ser kurdan jî xebatên te hene. Tu dikarî çêlî van xebatan bikî?

● Ji zû de ye ez ji bo doza kurdan tê dikoşim. Ev çar sal in ez di nava Yekîtiya Êzîdiyên Kurdistanê de kar dikim û yek ji endamên navendî yên YÊK'ê me. Me berê komeke govenda kurdî danî. Ez bi govendên gelek herêmên Kurdistanê dizanim. Ez pêşî fêrî govendên kurdan bûbûm. Lewre gelekî bala min dikişandin. Her wiha min li mala êzidiyan mamostatiya govendê dikir.

We bi piranî govendên kîjan herêmê digerandin?

● Me govendên herêma Botan, Mûş, Amed û Rihayê pêşkêş dikirin. Peyre piştî çar salan min dev jê berda û dest bi karê siyasetê kir. Lê em nema dikarin bi karê çandî û hunerî rabin lê em dîsa jî em piştgiriya wan xebatan dikin.

Jiyana li Ewrûpayê bandoreke çawa li ser kevnetoreyên êzidiyan dike û li ser vê pêşniyarên te çi ne?

● Ez dê li ser hemû kurdan bipevînim. Jiyana li Ewrûpayê dorê li kurdan teng dike û lewre di cihêkî teng de asê dimînin. Ez bi taybetî dixwazim li ser ciwanan rawestim. Ji ber ku ciwanên di nava du çandan de mezin dibin, lewma ne dikarin bibin alman ne jî dikarin xwe ji çand û kevnetoreyên dût bixin. Ji ber vê yekê jiyana bo wan dijwar e. Dema mirov bala xwe didê, ciwanên

xwe, ser axa bav û kalên xwe, ji me re çêtir e.


Baş e. Tu endama navendî ya YÊK'ê yî jî, ji bo ku hûn rê li ber vê asimilasyon û têkçûna ciwanan bigirin, hûn çi dikin û dê çi bikin?

● Li ser ciwanan Yekîtiya Xwendekarên Êzidiyan hatiye damezrandin û ji bo ku kongreya xwe pêk bîne, di nava tevgerê de ye. Hemû xwendekarên êzîdî dikarin bibin endamê vê yekîtiyê. YÊK'ê heta niha li bajarên wekî Celle,

kurdî ye.

Wekî em dibihîzin, li Ewrûpayê jî hin adetên kurdan yên berê wekî qelen, mêrkuştin û berberî tên meşandin. Hûn wekî keçeke kurd li ser vê yekê çi difikirin?

● Ez dixwazim bi taybetî li ser qelenê rawestim. Ev firotina mirovan e. Ji bo kirîna mirovan jî tu bedel tune ye. Mirov nikare mirovan bikire. Heşa mirov bes dikare heywanan bikire. Ji bo vê yekê bi baweriya min, ew kesên ku



Felek Uca her çiqas heya îro Kurdistan nedîtibe jî ji ber ku êzîdiye bi kevnetoreyên kurdewarî mezin bûye. Lewre girîngiyeke mezin dide çand û zimanê kurdî û doza vegera welêt dike.

Jiyana li Ewrûpayê dorê li kurdan teng dike. Ciwanên me di nava du çandan mezin dibin, lewma ne dikarin bibin alman ne jî dikarin xwe ji çand û kevnetoreyên dût bixin. Ciwanên me li Ewrûpayê ber bi têkçûn û helandinê ve diçin. Lewre ya herî bi xêr ew e ku em herin welatê xwe, ser axa bav û kalên xwe, ji me re çêtir e.

zar kir. Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku MED-TV gelê kurd û heta hemû gelan e û dewleta tirk nikare dengê gelên Kurdistanê qut bike. Çima? Ji ber ku dema dengê MED-TV qut bike, dê dengê 40 milyon mirovan qut bibe. Ev yek, ne li hiqûqa cihanê tê, ne jî gelê kurd qebûl dike. Her wiha ne mimkûn e ku ew bi van metodan bigihêjin armanca xwe.

We heya îro hiç Azadiya Welat xwendiyê an hûn li ser girîngiya zimanê kurdî dixwazin çi bi bêjin?

● Bi baweriya gelekî girîng e, ku kurd bi zimanê xwe rojnameyekê derxin û li hemû cihanê belav bikin. Bi rastî gelekî kêfa min ji Azadiya Welat re hat, lewre her tişt bi zimanê kurdî hatiye nivîsin. Zimanê me yê esas kurdî ye. Lewre divê hemû kurd bi kurdî bixwînin, binivîsin û bifikirin. Ev yek bi taybetî ji bo ciwanên kurd pêwîst û girîng e. Dema Azadiya Welat bixwînin dê hemû kevnetore û çanda xwe tê de bibînin.

Yanî Azadiya Welat dikare ji kurdên lal re bibe ziman?

● Rast e. Lewre bi salan e her tiştê me hatiye qedexekirin. Min Kurdistan nedîtîye lê ez dîsa jî bi kurdî dizanim û lewre xwendina bi kurdî ji ciwanên kurd re baş dibînim.

Ya herî bi xêr vegera welêt e

me li Ewrûpayê ber bi têkçûn û helandinê ve diçin. Wekî diyar e Ewrûpa ji me re nabe cih û war, bila ciwanên me berê xwe bidin welêt û kêlîke berî kêlîke vegerin welatê xwe. Erê em çiqas hemwelatîyên Almanayê bin lê em ser reş in. Em çiqas porê xwe zer bikin û çavên xwe şîn bikin lê em dîsa kurd û êzîdî ne. Em li ber Almanan biyanî ne. Bi wî awayî em tene nasîn. Lewre ya herî bi xêr ew e ku em herin welatê

Bielfed, Emerîş, Brêmen, Veyzel û Gîsen malên êzidiyan ava kirine. Di van malan de xebat û dersên kulturî tene gerandin. Wekî mînak komên muzîk û govendê li van malan xebatê dikin. Her wiha ji bo zarokan jî dersên olî tene dayin.

Çima we pêwîstî bi dersên olî dît?

● Ji bo ku fêrî adet, qewl û diyane-ta xwe bibin. Hûn jî zanin di ola êzidiyan de qewlên taybet hene û her tişt bi

qelen distînin, ji mirovahiyê dût in û qîmetê nadin mirovan. Çaxê mirov ji mirovahiyê fêr bike, jixwe qelen nas-tîne. Mirov nikare keça xwe bi 50-60 markan an jî 100 markan bifiroşe.

Vê dawiyê êrîşên li dijî MED TV'yê gurtir bûn. Hûn van êrîşan çawa dinirxînin? Her wiha helwesta PDS'ê çi ye?

● Me wekî şaxa PDS ya Eyaleta Bakur ev êrîş bi daxuyaniyeke şerme-

Baş e. Di pêşerojê de plan û projeyên te çi ne? Her te divê siyaseteke çawa bigerin?

● Ne tenê ez, hemû kurd divê ku di nava siyasetê de cihê bigirin. Armanca min jî wekî min got ez dixwazim ji bo hemû biyaniyan û bi taybetî kurdan xebatê bikim. Dawiyê ez dibêjim azadiya gelê kurd ne dût e.

Nameyeke vekirî ji Leyla Zana re

Li bîra min e, berî vê bi pênc salan ji niha min û te li bajarê Hewlêrême hevdu hembêz kir xemên du parçeyên welatê xwe, Başûr û Bakur, kirin ser hev, têkbişaftin û xoşava wan vexwar. Xemên me bi hev re bûn rûbarekî dijwar û herikîn, çûn ser derya Muxaz... Ew deryaya ku masiyên azadiyê tê de perwerde dibin û xeman dikujin. Ew deryaya ku çipkên avê fêrî lehiya berxwadanê dike.

Li bîra min e, berî vê bi pênc salan ji îro, li şeveke payîza welêt, me û tariyê



“Em dê li Amedê hevdu hembêz bikin”

esmanê li Hewlêrê hevrikî

kir.... Ta rojhilat me hizr û bîrên azad bi hev re strandin. Me vêkra dîroka bîndestîya xwe pel pel vekir. Çawa dijminan keziyên dirêj ên keçên kurd birîn, hêlînên me ji ser berûyên welatê me pelixandin, zarokên bêdayik û bav kirin... Kultura gelê me di gemara dagirkirinê de hat veruştin.

Erê, ev hesta berî vê bi pênc salan ji îro, damarên min vegirtî ji bîr nakim...ew hevdişîna bi te re ji bîr nakim. Em du jinên kurd yê dîroka dagirkirinê, xemên giran, janên mezin bo me kirine pişt û bar...Em du mirovên kurd dilê me bi yek xencerê parçekirî... îro em bi hev re birîna xwe derman dikin...xemên çiya û rûbarên welatê xwe têr noş dikin...

Li bîra min e, dema te ji min xatirxwestî, te got: “Min başûrê welatê xwe dît. Min ev parçe bi kîmyabaran û janên “enfalê” birîndar dît... Lê ez dixwazim, tu jî werî giyanê Amedê yê birîndar, bibînî... Min soz da te ku ez dê werim...Milê xwe bikim stûn bidim ber janê...êşa Amedê jê hilînim.

Li wê demê Leyla delal, tu xembar bûyî, ji ber helwesta hinek hêzên kurd kurdî ku sîngê xwe bo dijmin vekirî...Pûtey didin xwediyên wê xencera diya me pê serjêkirî...ew hovên ku tînan xaniyan li ser serê zaroya diherfînin...ew ên bi kîna şovenîstên gemargirtî zikên jinên kurdan didirin...

Heyhu Leyla delal! îro ez di vê nameyê de nûçeyên dawî ji te re radigihînim. îro wan dergiyê Başûr ji bo tank û topên dijmin vala kiriye... rê vekiriye, solên leşkerên serê zarokên kurd diperçiqînin... Her kesê bi zimanê kurdî bipeyive, zimanê wan dibirin... îro azadiya Başûr ya ku gel xwîn bo riştî bûye weris ku dijmin gel pê li sîdarê de...

Heyhu Hevala Leyla! Ew hêza ku Başûr ya ku wê demê te hêstir ji bo helwesta wan a xwar dirîştin... demê pûte dida dijminan, îro ji ber çavreşîya tirkî xwîna xortên kurd dirijînin. Erê, îro yê ji zir bapîran dibên baboj i te re yê ji kurên welatê xwe re dibêjin biyanî ne. Kesê me nîn e...Herin! Ji warê me derkevin...!!

Lê her çawa be...Kî bibêje dîrok ber bi serkeftinê ve diçit...Ez jî ya li ser soza xwe li rojêkê nêzik, ez û tu dê hevdu li Amedê hembêz bikin, strana azadiyê bistînin û edî qet nagirin...

SERFIRAZ NEQÎŞBENDÎ
(Cigîra Serokê Yekîtiya Rojnamevanên Kurdistanê)

Wêjeya Kurdî
Divê bi kurdî be

“Çi bikim ku qewî kesad e bazar
Nîn e ji qumaşê re xêredar” (Ehmedê Xanî)

Deshilatdariya Osmaniyan şeşsed sal dom kir. Vê serdemê zimanê erebî û farisî rewaç dît. Di bazara wêjeyê de bûn zêr û ziv. Nexasim zimanê dinê nebûn sifreya sor. Rewaca zimanê ereban olî, ê farisan jî edebî ye. Şaîr û nivîskarên faris her dem neteweperwerî ji xwe re kirine mertal û bi serhişkî berhemên xwe bi farisî nivîsîne lewre kultura eceban xemilandin. Her wiha ûmmetperestîya sunniyan red kirine û ji bo pêşveçûna çand û zimanê xwe têkoşîn dane. Fîrdewsî, ji wan re di warê çand û edebî de bû pêşeng.

Zimanê kurdî bi zimanê farisan re di bin sîgerekê de sîwan dibe. Gelo çima kurdî kete dafika pêşveçûnê? Çima şaîr û nivîskarên kurd berhemên bi zimanê biyanî nivîsîn? Çima wan pesnameyên xwe, ji qesasê padîşahê Osmaniyan re pêşkêş kirin? Ehmedê Xanî bersiva vê pirsê wiha dide:

Yanê ji tama dirav û dinar

Her yek ji me rave bûne dil-dar.

Mola Goranî di binyata xwe de kurd e û rûniştîyê devera Botan e. Goranî ji paşayên osmaniyan re mamostatî kiriye. Her wiha bo wan pesname jî pêşkeş kirine. Melayê Cizirî jî kurd e. Xelata paşan red kiriye. Pesna mîrekan daye. Xwe di nava rezên Kurdistanê de şebçirax hesibandîye. Wiha gazî mîrê Cizirê kiriye.

Gerçî der îqlimê rabi(çar) hate textê seltenet

Padîşahê heft îqliman selamkarê te be.

Çimena sultanîyê yek lale yek baxê te bî


Gulşena haqaniyê xarek ji gulzarê te bî

Pirbûna kesên wekî Melayê Cizirî cihê kêfxweşiyê, zêdebûna yên wekî Mola Goranî cihê qelsbûnê ye. Ehmedê Xanî jî bo ziman û wêjeya kurdî pir xebatên bêhesab bi kar tîne. Ziman û wêjeya kurdî azad nekir, lê nehişt bixeniqe. Berhemeke wekî Mem û Zînê diyarî gelê xwe kir.

Bêhîle û xûrde û tamam in,

Meqbûlê mûamila ewam(gel) in

Piştî vê serpêhatiya hanê, îro ji hîna piraniya kurdên ji bakurê welêt berhemên xwe bi tirkî dinivîsin û kultura wan dixemilînin. Bi bawerîya wan zimanê kurdî di warê nivîsînê de bi tîra wan nake û nikarin pê xwe îfade bikin. Lê balkêş e, ev kes lê naxebitin ku fêrî zimanê xwe yê zikmakî bibin. Gelo van kesan bi tirkî heya îro çend keleh vegirtine? Ev xebata hanê, tenê ji bo zimanê tirkî “qerwaşî” ye. Li aliyê din hin kurd jî qaşo bi kurdî dinivîsin lê ji nivîsên wan bêhna tirkî difûre. Ev kes dikin



Osman Sebrî bi hesreta welêt helbestên xwe ristine û bi kirasê kurdî xemilandiye.

ku kurdên xwerû bi kurdî difikirin, bi tirkî bifikirin: Mirov bûka axê bi qelîna mirtiban naheirimîne.

Osman Sebrî bi hesreta welêt helbestên ristine. Feqî û keşe ji derî qewitandine. Ala neteweperweriyê berz kiriye û helbestên xwe bi kirasê kurdî xemilandin. Nemir Cegerxwîn di hemû helbestên xwe de bi kurdî dirame. Bi kirasê Mele û Xanî, di demsala bîstan de helbestên xwe dixemilîne. Feqî û Herîrî ji bîr nake.

Zimanê kurdî ji bo wêjeyê ye. Nexasim di bin toz û xubara hezar salan de jeng girtiye. Ziman ji nû ve nayê afirandin. Bes pêwîstiya wî, bi dawşandina toz û xubara li ser wî heye. Ev doz jî bi neteweperwerî û zimanperweriyê dê biçe serî.

MAMOSTE FEHÎM

Li Navenda Çanda Mezopotamyaya İzmirê

● 14.11.98 şemf:

Panel: "Li Tirkiyeyê Medya" Ji Ûlkede Gündemê Hüseyin Aykol, saet: 18.00

● 15.11.98, yekşem: Konsera Koma Jiyana Welat 'Şervano', saet: 18.00

● 18.11.98, çarşem: Bîranîna Seyid Riza.


Koma Tofan, Hüseyin Ozan,

Ji Komeleya Piştigîrî û Çandê ya Tunceliyîyan Koma Muzîkî û helbestan,

Amadekar: Komeleya Piştigîrî û Çandê ya Tunceliyîyan, saet: 10.00

● 18.11.98, fn: Konsera Koma Amed 'Dergûş', saet: 18.00

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



Navenda Çanda Tohum

● 14.11.98, şemf: Tiyatroya Zarokan "Ev دنیا ya me ye" Nivîskar: Nihat Gılgır, saet: 15.00

● 15.11.98, yekşem: Semînera li ser tendurustiya zarok û dê. Dr. Ali Tezel Doktorê Jinan, Dr. Özgür Kasapçöpür-Psikologê Zarokan, saet: 15.00 YÇKM

● 15.11.98, yekşem: Bi zimanê huner mirov û civak-3

'Li ser helbestên evîn û şer'. Pêşkêşvan: Nazîf Uslu. Beşdar: Ayten Mutlu, saet: 14.0000

Medet Serhat hate bibîranîn


Rewşenbîrê kurd Medet Serhat di sala 1935'an de li Îdirê hate dinê. Dibistana seretayî û navîn li heman bajarî xwend. Lîse li Trabzonê qedand. Piştî wî wextî ku li Zanîngeha Stenbolê beşa Hikûkê xwendekar bû, di sala 1959'an de bi 'doza 49'an' hate girtin. Piştî ku hate berdan demeke dirêj li Stenbolê parêzerî kir. Medet Serhat endamê Baroya Stenbolê û parêzerê Rojnameya Özgür Gündemê bû.

Rewşenbîrê kurd Av. Medet Serhad, roja 12'ê sermaweza 1994'an li Erenköya Stenbolê li kolana Abdülkadir Nayan saet li dor 01.00'ê şevê jî aliyê hêzên dewletê ve hate qetilkirin. Kuştina Medet Serhat girêdayî listeya dewleta tirk a rewşenbîr û karsazên kurd hatiye pêkandin. Herwiha di vê listeyê de rewşenbîrên kurd Musa Anter û Behçet Cantürk ku ew jî ji aliyê hêzên dewletê ve hatine kuştin hebûn. Kujerên wan hîn jî ji aliyê dewletê ve nehatine diyarkirin.

Bi boneya salvegera qetilkirina rewşenbîrê kurd û parêzer Medet Serhad roja 10'ê sermawezê bi sazkirina TOHAV'a Stenbolê, li Navenda Çanda Tarık Zafer Tunaya panelek hate lidarxistin. Hevala Medet Serhad Yurdanur Serhad, parêzer Suat Parlar, Hasip Kaplan, Seroka İHD'ê û parêzer Eren Keskin wekî axîger beşdar bûn. Herwiha program jî aliyê 50 parêzerî ve hate temaşekirin.

Di panelê de hevala Medet Serhad Yurdanur Serhad axaftinek kurt kir. Wê got 'kuştina meçhûl tune ye, kuştina meşhûr heye.' Herwiha wê diyar kir, ligel ku pir li dû dozê geriya-ye jî negihîştîye tu encamê.

Parêzer Suat Parlar jî li ser dîroka kontrgerîla û cinayetên "meşhûr" nixandinek kir. Parlar wiha got: "Di dema Osmanîyan de jî çete hebûn. Ew çete wekî îro lûmpen, eşqîya, diz û çeqel bûn." Her wiha wî got ku ew çete di Serhildana Şêx Seîd û Dersimê de bi awayekî rêk û pêk hatine xebitandin. Parlar wiha berdewam kir: "Piştî van serhildanan, dewleta nehenî bîngeha xwe bi teknolojiyê xemiland û bi alîkariya împeryalizma Amerîkaya Yekbûyî di sala 1947'an de "Seferberlik Tetkik Kurulu (Rêxistina Çavdêriya Seferberiyê)" damezrand. Ev sazî bîngeha MÎT, Dibistana Cengê, Timên Taybet e." Wî bal kişand ser bersipsiyarê ve sazîyê û got ku çî tesaduf e berpirsîya-



Medet Serhat

rê wê Alpaslan Türkoş bû. Parlar di l'ê gulana 1977'an de li Stenbolê kuştina 7 xwendekarên şoreşger jî wekî minak da. Wî wiha got: "12'ê rezberê jî bo dewleta nehenî û kontrgerîla bû gawe mezim. Piştî wê dîrokê ew û hevalbendên xwe CIA, MOSSAD bi hev û din re xebitîn. Mirov nikare van bêyî tîkiliya împeryalist û sermayedaran analiz bike." Av. Suat Parlar got ku piştî derketina tevgera azadiyê ya kurdan politikaya berê ya anti-komünizm bû anti-kurd. Dewleta nehenî kontrgerîla rêzik û qaîdeyên qirêj hebe li dijî kurdan xebitandiye. Susurluk jî ji van bûyeran xaleke biçûk e."


Parêzer Hasip Kaplan jî li ser bicihanîna peywira parêzgeran rawestîya û wiha got: "Çete çawa bibe bila bibe, gerek em peywîrên xwe binin çî, em nebêjin 'çawa bibe, dewletek nehenî û kontrgerîla heye, em çî bikin em nagihêjin tu encamê.'"

Herwiha jî beşdarên Seroka İHD'ya Stenbolê parêzer Eren Keskin jî li ser qirêjiya hêzên dewletê sekinî. Wê got em îroj li ser qetilkirina rewşenbîrê kurd Medet Serhad disekinin. Lê ji aliyekî din ve li Cizîrê goristanek tomarkirî hatiye dîtin. Hêzên dewletê dixwazin wê jî weşêrin. Keskin wiha dawî li axaftina xwe anî: "Ne İHD, ne TOHAV ne jî sazîyên bi vî rengî dev ji wan bernadin.

EMİN BOZAN /STENBOL

TÎŞK

Niwîsa niwîskarê
me nekewte
destê me



BEKİR ŞIWANÎ

Di şeva aşûriyan de nivîskarekî kurd xelat girt

Rewşenbîrê aşûrî Dr. Melek Kavakçioğlu di l'ê avrêla 1949'an de li Midyadê jî dayika xwe bû. Wî dibistana seretayî li wir, ya navîn li Xerpêtê kuta kir. Paşê jî bo xwendina bilind çû Stenbolê. Li Stenbolê di nav xebatên Komeleya MED (Komeleya Mêrdînî, Elezîxî û Diyarbekirîyan) de aktîf xebitî. Melek li komeleyê, li ser pirsên ciwanên suryanîyan sekinî. Piştî xwendina doktoriye, di xebatên binerdî de, alîkariya şoreşgeran kir. Ew berî 12'ê rezberê, di çalakiyên li dijî faşîzmê de, li kêleka hevalbendên Deniz Gezmişan çî digire. Piştî 12'ê rezberê jî li dijî cûntaya faşîst dixebite. Lê pişt re pê dihisin û ew derdikeve derveyî welêt.

Kavakçioğlu, gelek analizên xwe yê ramyarî hene. Ji bo tîkiliyên dostanî û biratî yê kurd û aşûriyan jî hewldanên wî çêbûn. Ew di destpêka sala 1996'an de jî ber nexweşîya xwe çû rehmetê. Piştî mirina wî, li ser navê wî weqfê hate çêkirin. Weqf, hewl dide ku ji awira aborî ve alîkariya aşûreyên li welêt bike. Li tenîsta weqfê, komîteyek hate hilbijartin ku nivîsên wî berhev bike û bike pirtûk.


Di hefteya derbasbûyî de, pirtûk jî çapê derket. Pirtûk, ji nivîsên wî yê ramyarî û çandî û dîtina mirovên nas li ser wî, pêk tê û bi zimanê îngilîzî, swêdî, tirkî, erebî û aşûrî hatiye nivîsîn. Belê, bi munasebeta bîranîna wî û danasîna pirtûkê, di hefteya derbasbûyî de li bajarê Södertelyeyê şevê hate çêkirin. Şev li Mala Çandî ya Aşûriyan li Södertelyeyê çêbû. Zêdeyî 600 kesên beşdar bû. Pêşî, Emanuel Polî qala kesayetiya Kavakçioğlu kir û hinek zanyarî derheqê wî de da. Paşê stranbêjê aşûrî Hebib Musa çend stran pêşkêş kir. Şabo Behê û Azîz Hewşo bi helbestên xwe gelek tesîr li besdaran kirin. Pîreka Dr. Melek Kavakçioğlu, Elizabeth Kavakçioğlu jî di dawîya programê de beyan kir ku dixwaze bi navê komîte û weqfê çend xelatan belav bike. Piştî ku keşeyê Hêja Gabriel Barqasho xelata xwe girt, xelata din dane rojnamevanekî kurd Gabar Çiyan. Çiyan, berî niha jî bo biratiya herdu gelan û bîranîna Dr. Melek Kavakçioğlu destanek bi tirkî, di bin navê "Çiçekler de ağlar (Kulîlk jî digirin) de nivîsibû. Wekî tê zanîn, Çiyan, endamê Komîteya Karger a Înstîtuya (aşûriyan) Mezopotamyayê ye û her wisa di meha derbasbûyî de jî wek endamê jî Komîteya Karger ya Înstîtuya Kurdî li Stockholmê jî hatibû hilbijartin. Û hejmarek pirtûkên wî li ser çanda aşûrî û kurdan hene. Di dawîya şevê de xelatgirtina kurdekî bû cihê gengeşiyên erênî.



Dr. Melek

A. WELAT /STOCKHOLM

Firat yekî ji we bû



Navê wî Firat Kıvanç bû. Di 16'ê rezbera 1998'an de ji aliyê hêzên dewleta tirk ve hate qetilkirin. Ew hêj 12 salî bû. Jiyan û cîhan hêj nû fam dikir. Wî jî, mîna hemû zarokên cîhanê dixwest ku azad be. Wî jî dixwest di nava kenê xwe de xerabiyê bifetisîne. Dixwest ku ji dil û can xwe di nava listikan de winda bike. Dixwest ku tevî hevalên xwe li deşt û çiyayên Kurdistanê bigere. Firat mîna şitla rihanê jîn li der û dora xwe belav dikir. Mîna Çemê Ferat bi kêf û coş diherikî. Bi hêviya welatekî azad li pêşeroja xwe dinihêrt.

Ji jiyane, ji mirovan, ji dar û deviyên û ji teyr û lawiran pir hez dikir. Her ku keys didît, bi hevalên xwe re diçû ber Gola Wanê. Di nava golê de wan xwe dişuşt û dilistin. Welatê Ferat ne azad bû. Ji bo ku azad nebe, dijminê azadiyê xwîn dirijand. Dijmin dixwest ku jiyane li kurdan û li zarokên kurdan bike jehr. Dijmin dixwest ku ew birçî û tazî bimînin. Firat jî mîna hemû zarokên kurd xizan bû. Ji bo xwarinê nan bi zor bidest dixist. Carina ji ser sergoya xwarin kom dikir. Dijmin carinan bavê wî, birayê wî û carinan jî ap û xalê wî dixistin bin çavan û îşkence bi wan dikir.

Lê Firat li ber van zoriyan sing vedigirt. Xwe ji dil li jiyane dipêça. Mîna Çemê Feratê coşa xwe û hêviya we winda nedikir. Lê dijmin, lê dijminê hov, lê dijminê dev bi xwîn ev jî qebûl nedikir. Jiyan ji bo Firat zêde didît. Nediwest ku zarokên kurdan bijîn.

Firat Kıvanç, di hênika hiya esrê de ber bi mala xwe ve dimeşiya. Bi dilê paqij û bi çavên zelal riya xwe dom dikir. Dema ku di ber qûlubeya leşker re derbas dibû şeq req ji sîleha dijmin hat. Lê Firat riya xwe domand. Çend gavên din avêtin, sê caran teqîn li pey wî hat. Paşê Firat mîna şitla rihanê kete erdê. Xwîna wî axa Kurdistanê sor kir. Devê xwe vekir, xwest ku tiştêkî bibêje, lê hêza wî nemabû. Bêhna wî çikiya, dilê wî sekinî. Ew ji asîmanê Wanê, tevî karwanê şehîdên Kurdistanê bû....



Roviyê Fenek

Zivistan seqem û serma bû. Rovî ji birçîna gurî û çavzêlîl bûbû. Nikaribû ji xwe re nêçîrekî bidîta. Rovî fikirî û ji xwe re rêçek dît. Cibeyek li xwe kir, şaşik da serê xwe, da rê û meşiya. Hinekî çû li ser rê dîk dît. Silav da û got: "Seyda ez diçim hecê. Ma tu jî nayê em bi hev re herin?" Dîk got: "Rovî tu pir lewend î. Bi cibe, şaşik û bend î. Ez bi te ne bawer im. Tuyê fenekê bîni serê min. Li hecê tu yê gunehê xwe têxî stuyê min."


Rovî bi mizawirî kenîya û got: "Şa Seyda min tobe kiriye. Bi rebê jor, bi erdê jêr, bi şaşika min ezê gunehê xwe bavêjim. Ez tiştêkî nayîme serê te." Dîk jî bawer kir, da pey rovî û meşiyên. Hinekî çûn, li kewê rast hatin. Rovî piştî silavê, got: "Ya feqiyê delal, em diçin hecê, ma tu jî nayê?" Kew got: "Rovî tu lewend î, lê bi dek û sihrebend î. Ez bi te ne bawer im. Tu yê tiştêkî bîni serê min." Rovî dîsa bi rebê jor, bi şaşik û cibeyê xwe sond xwar. Dîk jî mîna şahidê xwe nîşan da. Kew jî da pey dîk û meşiyên.

Di rê de li werdekê rast hatin. Rovî got: "Gelî hevalan, em xwedî neyar û xwedî dijmin in. Bila kes dengê xwe neke." Ketin şkeftê û ra-

zan. Dema ku bû nivê şevê, dîk rabû û azan da. Rovî ew hemû civandî û mehkemeyek li dar xist. "Em xwedî neyar in. Eger cihê me bibînin, ê me bikujin. Seyda azan da û cihê me eşkere kir. Ez dibêjim heqê wî kuştin e, ma hûn çi dibêjin?" Kew dibêje: "Bi Qurana ku min xwendiyê tu rast dibêjî." Rovî radi-be, serê dîk jê dike, dîsa radizên. Di sehera sibê de kew radibe û dixwîne. Rovî dîsa mehkemeyê li dar dixê, "Em xwedî neyar in, te çima wî sa kir" dibêje. Kew jî dibêje "Ez feqî me û her sibe Yasîn û ayetan dixwînim." Rovî dibêje: "Ya Seyîd, wî cihê me eşkere kir, ez dibêjim heqê wî kuştin e, tu çi dibêjî?" Werdek dibêje: "Bi ocax û cedê min, tu rast dibêjî." Piştî ku rovî serê kew jêkir, hate ser werdekê û got; "Secera te tune, ez ê te bixwim." Werdekê fena rovî fam kir û got: "Birayêkî min û du heb şahidên min hene. Destûrê bide ez herim wan û secera xwe bînim." Rovî got: "De here ez li benda te me." Werdekê baz da û çû. Di rê de nêçîrvanek dît. Hal û mesele jê re got. Paşê ew û nêçîrvan hatin ber derê şkeftê. Wan gazî rovî kir. Rovî bi kêf derket. Lê dema nêçîrvan dît, her tişt fam kir. Êdî xelasiya wî tunebû. Bi guleya nêçîrvan hate kuştin. Werdek jî azad bû.

AMADEKAR:
GIRTÎGEHA ÜMRANIYÊYÊ

Hevalên hêja, cihên vala tije bikin.
Çavên li xweli li seriyên.
Rih dibe bihost nabe dost.
Şêr şêr e çi û çi mêr e.
Sal bi sal bi par.
Li zika xistin got ax min.



NALÎN AKMAN (TEMEN: 11)

Ez kulîlk im

Ez kulîlk im
Ez jiyan im
Ez daxwaz im

Kulîlka kesk im,
Kulîlka sor im,

Kulîlka zer im,
Ez kulîlka kesk û sor û zer im

Ji tiştêkî natirsim,
Ji bo ku ez jiyan im,
Ji bo ku ez azad im,
Ji bo ku ez daxwaz im

Ji Weşanxaneyeya Aram pirtûkek nû

Liceli Delikanlı

Di 22'yê meha adarê de Sema Yüce xwe kir agirê Newrozê û dû re Fikri Baygeldi bi dirûşmeya "Hevrê Sema fermanar e, ez fermanber im" xwe bi agirê Newrozê re kir yek.

Weşanxaneyeya Aramê bi navê "Liceli Delikanlı" pirtûkek li ser Fikri Baygeldi derxist. Pirtûk bi van gotinan dest pê dike: "Nakokî gava tûj bibin mêjî hişyar dibin, gava mêjî hişyar bibin qêrînen azadiyê ji zêde dibin." Pirtûka navborî ji sê beş, 176 rûpelan pêk tê û li ser kaxiza yekemîn qelîte hatiye çapkirin. Di dawiya pirtûkê de wêneyê Fikri Baygeldi yê di dema rakirina nexweşxaneyê û îlanên ku ji bo wî weşanên cur bi cur de hatine weşandin, cih digirin.

Ev pirtûka "Liceli Delikanlı" ji aliyê girtiya ji doza DHP'ê Meral Kızır ve hatiye berhevkirin. Di pêşeka pirtûkê de sedema berhevkirina pirtûkê bi vî awayî tê diyarkirin: "Hevrê Fikri, dema biryara çalakiya xwe ya mezin dide, nameyek bi sernavê "Hevalno" dinivîsîne û di bin nameyê de jî çend nişe hebûn. Nişe bi vî rengî bûn:

*Min li welatê min weşêrin û ji porê min hinekî jêkin û bireşînin ser axa Anatoliyê.

*Hevalê Can, nameya ku bi sernavê 'Ji bo mirovê ku em afirandine Serok Apo' min nivisandiyê, bi awayekî bigihîne Serok Apo.

*Hevala Meral tiştên ku min di deftera xwe de nivisandine bi awayekî bigihîne gelê min. Serkeftin."

Wek li jor ji diyar e pirtûk li ser xwesteka Fikri Baygeldi ji hêla min ve hate amadekirin."

Beşa yekemîn a pirtûkê bi helbesta, bi sernavê "Qirîna Zilanan" dest pê dike û bi notên rojane ên Fikri Baygeldi didome. Di nava rojnivîsên Fikri Baygeldi de nivîsên ku wî ji bo Ayçe İdil Ekmen, ji bo Zilanê û hinek çalakîyên ku di zindanê de pêk hatine, hene. Di nava rojnivîsên Fikri Baygeldi de xalên girîng ku balê dikişînin gelek in. Ji wan yek jî ev e: "Jiyan zehmet û bi tajan e. Hele ger zindan bê gotin, ev tajan hê jî zêde dibin. Lê vîna (îradeya) însên dikare bi ser van zehmetîyan bikeve." Dîsa di notên rojane yê xwe de ew şeva pirozbahiya Newrozê bi kêfeke xweş tîne zimên. Rewşa zindanê jî bi awayekî vekirî vedibêje: "Zindan nikare tu caran mirovan ji aliyê ruhî û fizîkî ve biqedîne, lewre ruhê me ji diwarên zindanê qewitir e.

Beşa yekemîn a pirtûkê bi nameya ku bi sernavê "Ji bo mirovê ku em afirandine Serok Apo", "Ji her kesê ku dibêje; Ez insan im re" û bi helbesteke bi sernavê "Hevalno", bi dawî dibe.


Beşa duyemîn a pirtûkê bi helbesta Fikri Baygeldi ya ku li Girtîgeha Sakaryayê di hucreyê de nivisandiyê, dest pê

dike û bi helbestên wî yê dinê didome.

Dîsa di beşa duyemîn de notên ku wî li ser edebiyata kurdî girtine, cih digirin û beş bi çîroka wî ya ku di 27'ê sermaweza sala 1997'an de li zindanê tevî pêşbaziya çîrokan bûye, cih digire. Sernavê çîrokê "Ez Liceyî me, torîne Şêx Seid im, xwediyê axa ku bi xwîne hatiye avdan im, sonda min ji Serok Apo re heye. Ez nahêlim ku dest bidin welatê min û di ber wê de ez dimirim" e. Û di çîrokê de şewata Licê, bîr û bawerîya gelê Licê bi awayekî vekirî hatiye vegotin.

Beşa sêyemîn a pirtûkê de daxuyaniya girtiyan PKK'ê û yê DHP'ê yê girtîgeha Çanakkalayê û nivîsa M. Can Yüce "Gulên Newrozê" cih digirin. Her wiha di vî beşê de axaftina Serokê PKK'ê ku di MED-TV'yê de bi kurmancî kiribû wergerandine tirkî û nameyên ku girtiyan jin ên PKK'yî û DHP'yî yê Girtîgeha Çanakkalayê ku ji Serokê PKK'ê û YAJK'ê re şandine cih digirin.

Wekî dawî em dikarin bibêjin ku pirtûkek hêja ye.



Nivîsên lehengên vî dozê ger hebin divê bîn çapkirin. Dîsa wek di pirtûkê de jî tê gotin axaftina Serokê PKK'ê ku di MED-TV'yê de bi kurmancî kiribû wergerandiyê tirkî. Divê ev axaftina bi kurdî bihata weşandin.

CEMİL ANDOK

Hilbijartin

OSMAN ÖZÇELİK



Di hilbijartinên dawîn ên sala 1995'an de HADEP'ê dengê milyonek û sed û heftê kesî girtibû. Di nav tevahiya dangan de rêjeya wê ji sedî 4.2 bû.

Endam, berendam, rêveber, piştgir û dilxwazên HADEP'ê ji ber ku li hêviya rêjeyê berztir bûn, di serî de piçekî xemgîn bûn, lê belê paşê kêfxweş bûn.

Dengên ku HADEP'ê girtibûn bala her kesî kişand. Ji ber ku rayedarên dewletê, partî û medyaya dewletê bi xwe dizanibûn HADEP'ê di kîjan mercan de ev deng girtine. Piştî hilbijartinê serokên partîyan, qunciknivîsên rojnameyan got: "baraj bilind e û divê HADEP jî bikeve meclîsê."

Bi rastî HADEP'ê suprîzek çêkiribû. Werin em vegerin ser mercên hilbijartinê yê sê sal berê.

1- Sê hezar û pêncsed gund hatibûn valakirin, xerakirin û şewitandin.

2-Sê milyon û niv mirov ji gundên xwe, ji

navçeyên xwe bi darê zorê hatibûn koçberkirin. Koçber li metropolên Tirkiyeyê bêkar û birçî bûn. Mafê xwe yî hilbijartinê wînda kiribûn.

3- Ji rewşên bîr, serok û lehengên gel sê hezar û pêncsed kes bi riya qesasnediyar hatibûn kuştin.

4-Şerê qirêj bi dijwarî berdewam dikir, çete li ser kar bûn.

5-Qanûna hilbijartinê anti-demokratîk bû û hinek xalên anti-demokratîk lê zêde kiribûn;

a) Li Kurdistanê polis, leşker û cerdevanan dikaribûn bi çekan biçin ser sindoqên dengdayînê.

b) Rayedarên dewletê dikaribûn saeta destpêk û bidawîbûna hilbijartinê li gorî kêfa xwe bi pêş de an jî bi paş de bikişînin.

c) Rayedarên sindoqan dikaribûn sindoqên dangan hildin û bi helikopteran bibin li biryargehên leşkerî vekin û bihejmêrin.

d) Rayedaran dikaribûn çendek herêmên hilbijartinê li cihekî kom bikin.

Li aliyê HADEP'ê jî astengî û nêzîktêdanên neyînî hebûn.

Carekê HADEP gelekî ciwan bû û kadroyên xwe di dema HEP û DEP'ê de wînda kiribûn. Hinek ji wan hatibûn kuştin, hinek jî nefî bûbûn û gelek ji wan girtî bûn.

Kurd cara yekemîn diketin hilbijartinan. Ev di aliyê tecrûbeyê de kêmasiyek bû.

Di hilbijartinan de propoganda, xala herî girîng e. Di vî serdema ragihandinê de medya di destê kê de be, yê serkeftî ew e. Medya, televizyon û rojnameya di destê dewletê de ye. Partiyên dewletê pere reşandin ser medyayê.

Di destê HADEP'ê de rojnameyê ku 10-15 hezar dihat firotin û MED-TV'ya nû hebû. MED-TV jî hem kêmbû û hem jî li gelek cihan dihat qedexekirin. HADEP'ê nikaribû deng û awaza xwe bigihîne gelê xwe. Heta gel sembola HADEP'ê "mînmînik" nas kir, hilbijartin qediya.

Hilbijêr, endam û berendamên HADEP'ê hatin tehdîtirin. Li navçe û bajarên Kurdistanê ji HADEP'ê re ji sedî 50-80 deng derket. Lê belê li gundan ev rêje daket heta ji sedî 3'yan.

Di van şertan de milyonek û sed û heftê hezar di qîmeta zêr de ye.

Li pêşiya me hilbijartineke nû heye. Şert zêde nehatin guhartin lê, ne HADEP ya berê ye ne jî gelê kurd...

Em bi hêvî û bi bawerî in ku nema tu bend û baraj dikarin li hemberî gelê kurd li holê bimînin. Gel îşareta yekemîn di Kongreya HADEP'ê ya Sêyemîn de da.

Tazele

Gundiye kurd cara yekemîn e ku diçe Stenbolê. Berê sibehê birçi dibe, diçe aşxaneyekê. Dinihêre ku mirovek cil û bergên nûjen lê ne. Diçe li ba wî; li ber masê rûdinê. Garson tê ji zilamê din re dibêje: "Fermo hûn çi dixwazin?" Zilam dibêje: "Çorba." Tê cem ê kurd ew jî dibêje: "Çorba." Dema şorbe tê, dibêje: "Ev şorbenîska me ye." dixwin xelas dibe. Garson tê ber zilam, zilam dibêje: "Tazele." Mirovê me yê kurd jî heman bersivê dide. Lê dinihêre ku dîsa şorbenîsk hat. Dixwe û derdikeve, tê gund. Gundî tèn cem jê dipirsin: "Ka Stenbol barekî çawa ye, te çi dît?"

Ew pirsan nîvco dihêle û dibêje: "Emaneta min li we, hûn herin Stenbolê eman eman li aşxanê me bêjin 'Tazele', lewre tazele şorbenîska sor e."

BERKEN BEREH

Ez Xwedê me

Zilamek, mirovekî wî li nexweşxaneyê dînan e, dibêje, ez biçim bibînim ka çawa ye, çi dike? Radibe diçe nex-

weşxaneyê. Di deriyê pêşin re dikeve hundir. Hinekî li salonê dimeşe, dînek rastî wî tê. Dîn jê re dibêje:

- Tu zanî ez kî me?
- Na wele ez nizamim
- Ez pêxember im!
- Baş e. Dibêje riya dikudîne. Hinekî dinê dimeşe dînekî din derdikeve pêşberî wî û jê re dibêje:
- Wî dînikî derew kir. Ji te re rast negot
- Ma tu çi zanî wî çi ji min re got?
- Belê. Wî negot 'Ez pêxember im?'
- Erê, rast e.
- Ma ew çawa pêxember e. Ez Xweda me û qet nayê bira min ku min pêxemberî daye wî. Lewre ew ne pêxember e.

Cinî û Arêwan

Yew dewey Zivêr de ariyeko pil bî-bî. Dewê ke dormalê Zivêr de bî, tim û tim enî areyî de arîşyê xo tehnayn e.

Rocêk yew ciniyek xelê (genimê) xo bena ariye, barê herê xo ser ra nana ro. Arêwan Xalê Hecî vîna û ey ra vana: - Qic min wirdê yê, kes keyê mi de



çiniko. Mi qican xo pê beyran de tene verdayî û ameyî ariye. Xeyr xo da arîşê mi lez bitahn, ez emşo agêrî keye xo.

Arêwan vano: "Haylo lo lo, haylo lo lo, haylo lo. La arîş tu îna rehet yeno tahnayîn. Hema az dest erzena to. Ti qîrena. Merdimê to yên mi kişen. Merdimê mi jî yenê merdimên to kişen. Dawe ma zehf bena pil. Yan arîş tu taniyen, yan ji eê teniyen."

Cinik se biko? Şaş manena. Peynê de vana: "Ê la wexta ke tu dest eyş min, ez qal nekîr, veng xo nêvecî se ben?"

Arêwan şa beno û vano: "Wexto me dest eyşt to ti veng xo nêvec her çi ha beno! Ez zerê xo kena weş, arîşê to enka tehnena. Ti emşo resena keyî, mi yanê qicanê xo de kuna ra."

ARÊKERDOX: AHMED DIRIH


BI XELAT...

XAÇEPIRSA BI XELAT (146)

XAÇEPIRSA

Ş	A	N	E	N	A	V	P	Ê	T
L	E	H	Î	A	D	A	R	Ê	
D	Z	G	E	T	R	B			
T	O	M	A	R	S	T	Û	R	
K	O	R	Ş	Ê	Î	N	A		
R	Î	Â	L	Î					
D	A	X	B	Â	R	N			
L	Ê	N	Î	R	A				
A	Ş	Î	R	A	X				

PEYVA VEŞARÎ → MAHA BADA



Trajedi Niviskarek (wêne)	Bi kirdki heval Eynî	Çerçî Kinivîsa Neteweyên Yekbûyî	Liva hewayê dengdarên bes'ê	Bi kirdki beygir Celebek çekê	Sembola iyotê
Xwedênas ... Yüce				Xwişka mezin Cinavkek	Hecce
Sazgeh Paşnavê Nazım Hikmet		Kesê pêdiviya wî bi avê heye berepaşki	Samî Zarîna sewalan		
Tipeke kurdî	Tipa dî r'yê Smif	Ava guhanên sewalan Cinavkek		Çem Navekî kurdan	
Navekî jinan	Bi kirdki çav Sembola selenyûmê		Qertafa neyînî Sewalek		
Rind			Tip dî q'yê		
		Roja em tê de ne			

Bersiva Xaçepirsa 144'yan

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihêjin destê me, em dê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 146'an Kasetê Mihemed Şêxo 'Ay lê gulê' ye

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsîn û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.



Pênc kesên ku xelata hejmarê 144'an Kasetê Hozan Hogir 'Pê' qezenc kirine ev in: Ali İmren/ Enqere, Fatma Dalgıç/Antalya, Yusuf Yağmur/Riha, Hanifi Baran/Semsür, Nihat Çolakan/Enqere

DERHEQÊ KIRMANCKÎ DE KOMBÎYAYÎŞÊ PANCINE

Stockholm, 14-16'ê tebaxe 1998

Roja 14'ê menga (aşma) tebaxe, Stockholm de kirmanckî (zazakî) ser o kombîyayîşê pancine dest pê kerd û hîrê rojî ramit. Nê kombîyayîşê de nê duyes kesî amade biy:

Yildiray Beyazgul	(Gimgim)
Mûnzûr Çem	(Dêrsim)
Haydar Diljen	(Sêwregi)
Nihat Elî	(Sêwregi)
J. İhsan Espar	(Piran)
Çeko Kocadag	(Gimgim)
M. Malmîsanij	(Pali)
Selîm Mûrat	(Pali)
Robîn Rewşen	(licê)
Mehmet Taş	(Dêrsim)
Şukrî Urgan	(Hêni)
Hamdî Ozyurt	(Gimgim)

Nê kombîyayîşê de amadebiyayoxî nê meseleyan ser o vindertî û meylê xo tesbît kerdî:

*Çend çekuyê (kelîmeyê) ke ca ra ca ciya vajiyênî (Yer yer farklı söylenen birkaç sözcük)

*J, C yan Z? (J mi, C mi yoksa Z mi?)

Nuştişê tayê (tanî) çekuyanê ke cumle miyan de piya -se cita- vajiyênî (Cümlede birlikte kullanılan bazı -çift- sözcüklerin yazılış biçimi)

*"Ke" û bêhnok ("Ke" ve virgöl)

*Nuştişê notanê biblîyografikan (Bibliyografik notların yazılış biçimi)

*Karî ra (Fiilden)

*Termê gramerî (Dilbilgisi terimleri)

*Termê leşkerî (Askeri terimler)

Cêr ra ma nê xusûsan de meylê kombîyayîşê nusenî.

Tiya de çekuyê nêrî (bi tirkî "eril sözcük") ver de (n), çekuyê makî (bi tirkî "dişil sözcük") ver de (m) nusiyayo. Tayê çekuyanê nêriyan dim a suffiksê "-e" nusiyayo. No yeno a mana ke, eke formê nêrî dim a "-e" ame, o çeku beno makî. Nimûne: şehîd, -e. Yanî, çekuyê "şehîd"î nêrî yo (lajeko yan zî camêrdo şehîd), eke nê çekuyî dim a "-e"ame, beno "şehîde" û no çekuyê "şehîde" makî yo (kêneka yan zî ciniya şehîde). Tayê cayan de, çekuyanê makiyan dim a herunda "-e" de "-i" yena, tayê cayan de ne "-e" û ne zî "-i" yena.

6. Çend çekuyê ke ca ra ca ciya vajiyênî

Kirmanckî de tayê çekuyî mintiqa ciya vajiyênî. Ma nê çekuyan ra çekuyanê cêrînan ser o munaqêşe kerd û miyane nînan ra yew yan zî di formî weçinay (vîjney).

meylê kombîyayîşêformê binîtirkî
awe (m), awî (m)aw, ow, uwe, axwe,
awke, awki, awk, oksu
ciwiyayeneyaşamış biyayışyaşamak
çike..... ke..... çünkü
çiturçi tur, çi tir nasıl
emşo emso, esmû, eşmo,
imşo, işmo, imş bu gece
emser.....esmer, imser, ismer..... bu yıl
ewroewrû, eyro, êro, êr, îro.....bugün

her..... hur, wir her
her dihurdi, wurdî, wurnaher iki
herdiyan.....hurdêna,hurdêmîna,
.....wirdîni.....her ikisi
Her diyan wend...Hurdêna wend./
Wirdîni wend..... Her ikisi okudu.

her kes.....wir kes..... herkes
her roj.....wir ro..... her gün
heyat (n)hêyat..... hayat, yaşam
hurdi..... wurdî, wurdîufak, küçücük
hûmar.....hûmare, ûmare, amore.....sayı
Îstanbul.....Estembul, Estemolİstanbul
Kurdîstan (n).....Kurdistan (m) Kürdistan
Kurdîstanê ma (n).....Kurdistan ma (m)

.....Kürdistanımız
labelê.....lablê, labrê fakat, lakin
milet (n)milleta ma (m),
miletê ma (m)ulusumuz, milletimiz
milî.....millî, millî.....ulusal, milli
na (m).....ena, ina, henaiçin)
nan (n)na, non, nûn, no, nû.....ekmek
naye (m).....nay, enay, inay, hena.....bunu(dişil için)
ney (n).....nê, enî, inî, enê, inê..... bunu (eril için)
nê.....nî, enî, inî, enê, inê..... bunlar
nînan.....nînû, eniyan, iniyan, enyo.....1) bunlar

2) bunları
niyadayene..... niya dayene..... bakmak
niyade..... niya de bak
no (n).....eno, ino, enû, nû, ini.....bu (eril için)
nuşte (n).....nuştaye..... yazı, muska
nuştene,nivisnayene niştîşyazmak
nuşttox, -e.....nuştêx..... yazar, yazan
qisa (m), qesa (m).....qese (n), qise (n)söz, laf
qisey/ese y kerdene.....qisê kedene, qese ker-
dene.....konuşmak

rey.....ray, rêy, rêkere
reyê.....rayê, rêy,bir kez, bir kere
reyke.....rayki, rêki bir kez, bir kere
rey-rey ray-ray, rê-rê bazan, arasıra
seke.....se ke, gibi
tayê tay, toy, tanî, tayn, taynî bazı
tiya ta, tiye, etiya, etya, ita,
ewta, owta, wita, weytabura, burası
ucawica, wuca, weyca, wija, wiza,
wuza, uza, uja, ewca, owcaora, orası
weyra.....ewra, owra, ora, orası

yewbiyaye (n),
yewbiyayîye (m)yobiyaye (n), yobiyaya (m)
.....birleşik
yewbiyayene,
yewbiyayîş.....yobiyayîş, yewbeyîş birlik
yewbiyayene..... yobiyayîş, yewbeyîş birleşmek
yewbiyayîş (n).....yobiyayîş, yewbeyîş birleşme
yewiye (m).....yewey, yewî, yowê birlik
ziwan (n7)..... zan, zon, zo, zû..... dil

2)J, C yan Z?

Kirmanckî de tayê çekuyî estê ke tayê cayan de bi

"J", tayê cayan de bi "C" tayê cayan de zî bi "Z" vajiyênî. Meylê kombîyayîşê nê forman ra formê "J"yinî sero yo. Yanî eke çekuyêk (yew çeku) wayirê ne hîrê forman bibo, nînan ra formê "J"yinî tercîh beno.

Nimûne:

meylê kombîyayîşê..... formê binî..... tirkî
JC, Z
çije (n)..... çice, çizik, cizik meme
dej (n)dec, dezağrı, acı, üzüntü
deyayene.....decayene, dezayene ağrımak,
.....acımak, üzölmek
dewij- e dewic,dewizköylü
dêrsimij, -e dêrsimiz Dersimli
erjan, -eercan, arcon, erzanucuz
erjaniye (m)erconey, erzaniyeucuzluk
eskije (m)..... eskici, eşkuçi, eskize kuru üzüm
espîje (m)..... espici, aspize bit
gijik (n)..... gicik, gizik sac
kej, -e..... kec, kez sarışın
laj (n)..... laç, laz oğul, oğlan
lajek (n).....lacek, lazek.....erkek çocuk, oğlan
lej (n)..... lec, lez kavga
lej kerdene..... lec kerdene, lez kerdene....
..... kavga etmek
lojine (m)..... locini, lozine baca
mij (n)..... mic, miz sis
nimaj (n).....nimac, nimaz, nemaz, nime....
.....namaz

paliyij, -e..... paliwic, paliyizPalolu
pirojine (m)pircini, pirozine kalbur
qij, -eqic, qiz küçük
roj (n)roc, roz güneş
roje (m)roce, rozeoruç
şaristanij, -e..... şaristonîc..... kentli, şehirli
vajevace, vaci, vazesöyle

3) Nuştişê tayê çekuyanê ke cumle miyan de piya -se cita, vajiyênî.

Nimûne :

çende..... ende...
çi.. çi..
ge... ge...
ge-ge.... ge...
ha..ha..
hem..hem..
ne..ne...
yan.. yan

Tayê kesî gama ke nê çekuyan nusenî, miyanê nînan de virgöl ronanî, labelê meylê kombîyayîşê gore bêvirgöl nusiyênê (yenê nuştîş).

Nimûne:

Meyle kombîyayîşê.....nuştîşê binî
Çende ez zana ti zî ende zanî.....Çende ez zana, ti zî
ende zanî.
Çi cinî çi camêrd heme amey.....Çi cinî, çi camêrd
heme amey.

Ge ez yena ge-ge ti yenî.....Ge-ge ez yena, ge-ge ti yenî.

Ha ez ha ti, ferqê ma çin o.....Ha ez, ha ti, ferqê ma çin o.

Hem ez yena hem ti yenî.....Hem ez yena, hem ti yenî. Him ez yena, him ti yenî.

To ne wendo ne nuştö.....To ne wendo, ne nuştö.

Yan ez yena yan yenî.....Yan ez yena, yan ti yenî.

Ya ez yena, ya ti yenî.
O yo biramo

WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKÖYÜN
■ Yönetim Yeri:
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308

Beyoğlu İstanbul
TEL: (0 212)
251 79 37 251 90 13
FAX: 251 95 85

■ Gerîndeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN
■ Berpirsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım
■ NÜNERİTİYEN ME
(Temsilciliklerimiz)
■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83

■ Mersin
Tel: 0 (324) 233 83 96
■ İzmir
Tel: 0 (232) 425 37 02
München:

(Nünerê Giştî yê Ewrûpayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815
■ Swisre:


İhsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07
■ Hollanda:
S. A. Fewzi
Tel-Fax: 31 10 48 555 43
■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsvi

YÖK ji aliyê xwendekaran ve hate protestokirin

YÖK destikê Cûntayê ye

Ji bo protestokirina YÖK'ê hemû xwendekarên li zanîngehên Tirkîyeyê mil dane hev û damezrîna 17 saliya YÖK'ê bi forûm, semîner, meş û daxuyaniyên çapemeniyê Protesto kirin. Li Stenbolê polîsan êrîş bire ser çalakiyên protestoyî û 53 xwendekar bi awayekî hovane xistin bin çav.

Li dijî erîşkariya Polîsan ji xwendekaran li ber xwe da û çalakiyên birin serî.



Ji bo protestokirina YÖK'ê xwendekaran roja 6'ê meha sermawezê çalakiyên protestoyî li dar xistin. Wekî her caran çalakiyên xwendekaran ên protestoyî ji aliyê polîsan ve hatin astengkirin. Li gorî ragihandinan 10 hezar polîs li Qada Bayazîd û der û dora wê hatibûn peywardarkirin. Her wiha xwendekar beramberî êrîşên polîsan man û gelek xwendekar hatin binçavkirin. Roja îne li ber Zanîngeha Stenbolê bi hezaran xwendekarî ji xwendekarên çepgir bigirin heta yên îslamî YÖK bi çalakiyê û daxuyaniyên çapemeniyê protesto kirin. Pêşin daxuyaniyek li ser navê xwendekarên Zanîngehên Stenbolê, yên HADEP'î, SİP'î û Koordînyona Xwendekarên Zanîngeha Stenbolê hate xwendin. Di daxuyaniyê de hate gotin: "Zanîngeha me hatiye dagirkirin. Deriyê zanîngehê li zarokên kedkaran tê girtin. Bi qanûn û sistema perwerdeya bîhêzîkî erîşî me dîkin. Armanca YÖK'ê ji holê rakirina zanîngehan e. YÖK di zanîngehan de navê paşverûtiyê, tîkiliyên çeteyan û dijîminatîya azadiyê ye. YÖK baskê MGK'ê ye di nav zanîngehan de ye. Her çiqas ew bi YÖK'ê bi polis û faşîstan û bi MGK'yê pêşerojê girêdayî paşverûtiyan û arîzekerîne bo me bixwazin çêkin jî, em ê di nav têkoşîna afirandina rojên azad û wekhev de cihê xwe bigirin." Piştî ku daxuyanî hate xwendin li ber Kampûsa Navendî ya Zanîngeha Stenbolê komeke ku ji 500 kesî pêk dihat xwest ku daxuyaniyê çapemeniyê bide. Koma li ser navê DÖGP (Platforma Ciwanên Xwendekarên Şoreşger) pêşin bi awayekî koordîne xwest ku tevî xwendekarên din ên li ber deriyê zanîngehê bibe. Lê piştî ku pankartên xwe derxistin polîsan êrîşî wan kir. Li ser pankartên wan sloganên bi vî

rengî hebûn: "Em ê destên ku xwe dirêjî serok kirine bişikînin. Em ê şerê li Kurdistanê hilgirin zanîngehan. YÖK berhe ma 12'yê rezberê ye. Bimre YÖK bimre MGK." Bi êrîşa polîsan xwendekaran xwe berdane nav kolanên Bayazîd û Laleliyê. Ji Bayazîdê heta Aksarayê nav Bazara Balkan, polîsan li pey xwendekaran baz dan. Di vê maratone de car caran xwendekaran bi molotofan bersiva polîsan da. Balkêş e polîsan dev jî kontrolkirina meydanê berdan û hemû tevî "robokop" û "Yunusan" tevî "maratonê" bûn. Gelek xwendekaran kumîk di serê xwe re derbas kiribûn. Di wê navberê de çend provakator ji esnafên Laleliyê li çepikan xistin. Di encama vê operasyona "maratoni" de 53 xwendekar bi awayekî hovane hatin binçavkirin. Digel van yekan 42 xwendekarên îslamî jî heman rojê hatin binçavkirin. Piştî binçavkirinê bi rojekê polîsan bi ser malên xwendekaran de jî girtin. Ji aliyê din ve raya giştî ya demokratîk li dijî erîşa polîsan û binçavkirinê reaksiyon nîşan da. İHD'ê daxuyaniyek kir û erîşa li dijî xwendekaran şermazar kir. Roja 10'ê sermawezê jî billî çend xwendekaran, yên din hemû jî Adliyeya Sultanahmetê hatine serbestberdan.

Cunta MGK û YÖK

Ji roja damezrîna Komara Tirk heta roja îroyîn ji aliyê cunta û rêveberên sivil ên vê komarê ve gel hatine qetilkirin, piştaftin, sirgûnkirin û girtin. Vê komarê tîra xwe mafên karkeran, karmendan, xwendekaran û hwd. bi awayekî giştî daxwaz û mafên civakê yên herî insanî an çewisandîye an jî nasnekiriye. Wekî tê zanîn di ronîbûna civakê de perwerdehî cihekî girîng digire. Dema ku mirov bi awayekî hûrbînî li ser kêşeya awayê per-

werdeya vê sistemê raweste, dê bibîne ku vê sistemê her dem xwestiyê mirovan li gorî xwe perwerde bike. Ji bo ku nêrînen li dijî awayê perwerdehiya xwe bêtesîr bixe, serî li riyên zordarî û çewsandinan daye û bi qanûnên cuntayê hemû dibistan û zanîngeh kirine wekî qîşleyan. Bi vê mebestê dibistan û zanîngeh ji perwerdehiyê zaniştî dûr ketine û bi tevahî hatiyê xwestin ku kesên paşverû û sistemeke paşketî ku bi tenê Kemalîzmê ve girêdayî ye di zanîngan de serdest be. Cuntayê piştî ku li Tirkîyeyê darbeya xwe kir di sala 1981'an 6'ê meha sermawezê de YÖK (Lijneya Bilind a Hîndekariyê) damezirand. Bêguman ji roja damezirandina YÖK'ê heta îro xwendekarên zanîngehan di 6'ê sermawezê de YÖK'ê bi çalakiyên xwe protesto dîkin. Bi damezirîna YÖK'ê re, serdestiya leşkeran a di zanîngehan de fermîtir bû. Digel wê yekê leşkerên sivil jî di zanîngehande bi cih bûn. Awayê perwerdehiyê jî binî ve hate guhertin. Êdî li gor qanûnên YÖK'ê diviyabû xwendekarên demokrat, welatparêz û şoreşger ji zanîngehan bihatina dûrxis-

hene ku di ser qanûnan re kar dîkin. YÖK jî yek ji wan rêxistinên ku di ser qanûnan re kar dîkin e. Piştî ku YÖK di sala 1981'an de hate damezirandin ji ber reaksiyonên xwendekaran û raya demokratîk car caran qaşo naveroka wê hate guhertin. Lê belê tiştê di YÖK'ê de neguherî. YÖK her dem li gorî daxwaza cuntayê ma û niha jî di bin serokatiya MGK'ê de hebûna xwe di zanîngehan de diparêze. Heta niha tu hikumetê jî bo jî holê rakirina YÖK'ê ji tîrsa cunta û MGK'ê pêşnûmayek amade nekiriye û nedaye ber raya meclîsê.

Dema mirov sistema zanîngehên Tirkîyeyê û yên Ewrûpayê bide ber hev wê bê dîtîna ku zanîngehên li Tirkîyeyê wekî eniya şer tîna bikaranîn. Bi tevahî tê xwestin ku bi rêz û rêçik û qaîdeyên leşkerî bîna îdarekirin. Di gel van yekan rejîm da ku karibe heq ji lêçûyînan şer derkeve, bazirganiya perwerdehiyê jî dike. Ji bo ku karibe vê yekê bixe jiyane jî, zanîngehan dide arîzekerî. Bi salan sistemê xwestiyê xwendekaran bixe bin desthilatdariya xwe. Ji ber wê yekê jî ge-



Di çalakiya xwendekaran de maratona polîsan Stenbolê.

tin û avêtin. Bi vê yekê wê rê li ber xwendina wan bihata girtin. Bêguman piştî darbeyê qanûna cuntayê ji hingî heta roja îroyîn xwest ku rê li ber xwendina xwendekarên welatparêz û şoreşger bigire û di her fersendê de, an ew ji zanîngehê avêtin an jî avêtin girtîgehan.

Rêxistina di ser qanûnan re: 'YÖK'

Wekî tê zanîn li Tirkîyeyê gelek rêxistin hene ku neqanûnî ne. Hinek jî

lek tiştên neqanûnî kirine. Wekî minak kesên ku îro wekî çete tîna nasîn berî vîga bi salan dîsa ji aliyê dewletê ve di zanîngehan de hatine bikaranîn. Li ser navê dewletê erîşî xwendekarên şoreşger û welatparêz kirine. Dîsa di nav zanîngehan de ji bazirganiya erofînê bigirin hetanî hemû karên kirêt ên din YÖK'ê, bi rîya wan kesên ku em îro wekî çete dinasin daye kirin û bi vê mebestê xwestiyê jiyaneke pûç û dûrî zanyariyê li zanîngehan bike serdest.